

Li Skandînavya  
gelekî bîndest:  
Samî

Rûpel 6



## Di berbangaya sedsala 21. de li Kurdistanê: 70 roj li ser hev îşkence



Tevî biryara şerawestina PKK'ê zilm û zora dewleta Tirk li Kurdistanê didome. Gundiyên Banayê pêvajoya 70 rojan di bin çavan de hatin girtin û her cure îşkence li wan hate kirin. Ev tewra hovane ya dewletê roj bi roj bêhna gel teng dike û mêldarî ji bo ji nû ve destpêkirina şerê çekdarî xwe nişan dide. Ji ber ku dewletê heta niha tu gavên pozîtîv ên berbiçav neavêtine.



### KURDISTANA BAŞÛR Û AZADÎ

Zehfên malbatên Kurd ên ku gundên wan ji aliyê hêzên faşîstên Sedam ve hatine xerakirin, niha li bajaran di şertên pirr dijwar de, di nav odeyêke biçûk de dijîn.

Rûpel 9



### KIŞTIŞÊ ARMENIYAN

Ewro hinî yew sir niyo ki dewletey Osmanîyan bi sehizaran reyra Armenî kiştî. Ebe gore bê Garo Sasunî, jenosîdê menga (aşma) Nîsanî 1915 di yew milyon ra vêşî Armenî bi destê Tirkan kişiyayî.

Rûpel 12



## Bixwîn Welat bistîn felat

Zana nebî tu kor î  
Rast û durist rê nabî  
Riyek dûr û xerîb î  
Darê rimê zil nabî

Zimanê Kurdî bixwînîn  
Hûn ji hev re bibêjin  
Ceger û dil bisojin  
Dûrbîn di dest te hebî

Xiyanetê neke tu  
Rojnameyê bixwîn tu  
Lehceyê xwe bizan tu  
Desmal bi dest qîzan bi

Welatê Kurd xweş bike  
Bihuştek ronî bike  
Qîz û kuran yek bike  
Ji agir azad dibî

Tarîtiyê bine xwar  
Deşenê rake bi dar  
Dilawêr û ne dilsar  
Xweyê komara xwe bi

Dilpak nebî li bira  
Pişt û dil ned neyara  
Xelas nakî diyara  
Xefner û dilgeş nebî

Heta nebî dîdevan  
Tu naçî serê çiyar  
Nabîni tavî, baran  
Tu nabit dîne mênî

Nedî dest xwe alfabe  
Tîpê xwe tu nizanbe  
Xweyê dadgeh nebe  
Tu nabit xwey evresî

Denêr û dersdar nebit  
Weke gejgering nebit  
Newroz bi dest te nebit  
Xweyê gotardan nebî

Ern erno erwende  
Hersî ne bin li ba te  
Kes ala ê neda te  
Her xweyê gotûgo bi

Welat kanî tu kanî  
Kurdo tu hevpimanî  
Gelek tu şer giran î  
Tixtor nûroj te anî

**Tixtor Nûroj  
Gundê Arinc**

## Zanîn serbestî ye nezani bîndestî ye!

Di destpêkê de ez silavê şoreşgerî li xwendevanên Welat dikim. Gelî hevalên şoreşger, pêwîste em bizanibin bi çî awayî zordarî û zehmetî li welat û gelê me dibe. Divê em rûmet bidin zanîne, qedrê wê bigirin û wezîfa wê jî pêk bînin.

Ez xortekî bîst (20) salî me. Min tu carî xwendina Welat ser xwe re neboran-

diye. Ez gelek bi Welat şa dibim; ji ber ku xwendina zimanê xwe jê hîn bûme; spasdarê rojname û nivîskarên Welat im.

Dema mirovên me zanibin û li zanebûnê bipirsin wê tim serfiraz bin û li ber xwe bidin. Dema nezan bin wê tim barê bîndestiyê bikişînin. Gotineke pêşyan heye dibêjin: "Jin çûn hawarê

mer ketin kewarê" îro roja cengê ye. Divê em tev rabin û xebata şoreşgerî bikin. Êdî dil û kolefî nema ye. Divê em jî azad bin.

Şer-rawestina PKK'ê jî dil ve pîrozbahî dikim û bawerim ku êdî em serfiraz bûne. Bijî Welat.

**Abdurrahman  
Kaya  
Batman/Pişêrî**

## Dayîka gelê Kurd çû rehmetê

Em çend welatparêzên li Almanya, li bajarê Nienbergê ne. Roja ku me ji Kurd-Ha di Radyoya Kurdî de mirina dayîka xwe bihîst, em gelek êşyan. Em êşyan ji bo ku dayîka Serokê me bû. Ger ev dayîk Serokê me neaniya rûkela dinê, tu kes ji me re rêberî nedikir.

Dayîka Serokê me ji nava me veqetiya û cihê xwe yê bi rûmet di nava şehîdên keç û xortên ciwan de girt. Em bi te serbilind in ku te ji me re, ji welatê me re ev Serok anî rûkela dinê û li me xwedî derket.

Dayîka me, tu rehet raze. Dayîka gel, dayîka gerîla û

şervanan, dayîka Serok, tu di nava gerîlayên şehîd de rehet raze. Tu êdî dayîka şehîdan î. Serê gelê me û serê Serok sax be. Dayîka me oxir be ji te re, silavan li şehîdan bike û rehet raze.

**Zinar Almaz  
Almanya**

## Bi xêr hatî rojnameya me

Em bi derketina Rojnameya Özgür Gündemê gelek şa û kêfxweş bûn. Daxwaziya me ew e ku, Özgür Gündem roj bi roj derkeve û me di nava rojnameyên kolonyalîstan de nehêle.

Weke hûn jî dizanin, li Tirkiyê rojnameyên rojane gelek in, lê yek jê jî ne baş in. Ji ber vê jî dive me li rojnameya xwe xwedî der-

kevin, alîkariya xwe ji wan nebirin.

Li ser rûyê dinê miletekî bê kultur û bê dîrok tune. Lê milletên xerîb û bêkes hene. Em gelê Kurd jî di nava wan de ne. Divê em dîroka xwe, zimanê xwe, kultura xwe nas bikin û bi ser kevin. Mirovên ku dîroka xwe, kultura xwe nas neke, xwe jî nas nake. Ne-

zanî xerab e.

Em dixwazin ku rojnamevan li ser rojname, çîrokvan, li ser çîrokan, dîrokvan li ser dîrokê û mûzîsyen jî li ser mûzîka me bixebitin û bi ser kevin.

Serkeftina we û serkeftina gelê me ji dil ve, dixwazin.

**Koma Serora Nat**

## Çend gotinên biratiyê

Ez dixwazim bi alîkariya Rojnameya Welat ji gelê Kurd re çend gotinên biratiyê bi rê bikim. Şerrawestina Partiya Karkerên Kurdistanê li hember dewleta Tirk ji bo sekna xwînê, fersendeke pîrr mezin e.

Xuya ye ku gelê Tirk bi vê yekê kefxweş e. Naxwa-

zin zarokên wan li welatê biyaniyan bêne kuştin. Lê Dewleta wan vê nabêje. Silo, Erdal û Ecewîr ên bêdîn ber xwînê nakevin û ji aliyê aborî ve li mesele dinêrin. De bila ew û gelê xwe di qirika hev de bin.

Lê, divê em gelê Kurd vê fersendê baş binirxînin

û tev weke bira bi hev re rûnin û rabin. Em nebêjin evê han misliman e, yezîdî ye, fileh e, yan jî Ermenî ye. Dijminê me tevan yek e. Armanca me tevan divê yek be. Ev yek ji bo Kurdistanê fersendeke dîrokî ye.

**Salih Demir  
Antalya**

## Her tişt ji bo serxwebûn û azadiyê

Bi nav û ismê Yezdan, ji dil tîn ev xebardan Selat di gel selaman. Li te enbiya semaman Di gel eshab û îlan ewan xwedî kemalan Ji xebatê newestan, hemû gelê Kurdisitan Selavên germ û ji bo hewe me anîn Hem ji bona şehîdan, gerîla û egîtan Li ser serê çiya nin, ew sembola jîyan in Karkerên Kurdistan in, sincê çavê neyar in Divê kêfa me xweş be, rûyê dijmin jî reş be Serê me tim bilind e rîya me rast û rind e

Em ala xwe rakin rûhê şehîdan şa kin Bila dijmin bitirsî ew e pepûkê birçî Ew e xedar û xwînêrê, ew e destên bi qirêj Hemû wê bîn şikandin nefes wê bîn çikandin Li wan û yên li rex wan nêzik e rabe ferman Divê em mil bidin hev, her dem bi roj bi şev Gundî, feqîr û rênçer, softî û şêx û serwer Mele, mamoste, dixtor, jin û mên û gir û hûr Şaş nabin em bi hev re bijîn yan biçin qebra Bikin ceng û xeb ta rizgar bikin vê axê

Vi dijminê wek xabûs ne dîn hişt û ne namûs Ya Allah û ya Xwedê, ji Botan ta Serhedê Dîne Îslmê nas ke Kurdistanê xelas ke Ji destê van neyaran, van seg û sextekaran Derman bikin birînan, xweş kin dilê hezînan Bijî azadiya me, bijî dilşidiya me Bimirin neyarên xwînaxwar, bimirin hemû kole-dar

**Xortekî 16 saliyê welatparêz  
Silopi / Şirnex**

## FERHENGOK

**Beng:** Kesê evîndar

**Bêgiyan:** Bêrih

**Bizav:** Liv, tevger, hereket

**Çarenûs:** Qeder

**Delamet:** Peywir, vatîni

**Dêrandin:** Bijartin, jê niqandin, ji hev derxistin

**Gelş:** Pirsgirêk, problem

**Giyan:** Rih

**Hevpar:** Pişkdar, Şîrik (ortak)

**Heyam:** Dem, kate, çax

**Hinartin:** Şandin

**Kêlî:** Bîsk, weş, deqîqe

**Lec:** Gengeşî, munaqeşê

**Malaştin:** Paqijkirin

(silmek, temizlemek)

**Mûnandin:** Honandin

(örmek)

**Qanî:** îkna

**Proses:** Pêvajo, doman

(süreç)

**Pêngav:** Gav

**Pend:** Şîret, nesîhet

(öğüt)

**Pereng:** Agirê pizot (köz ateşi)

**Rêxistinkar:** Organîzator (örgütleyici, düzenleyici)

**Sergevaz:** Mexrûr, Xwedî esalet

**Şilf:** Singû, tazî, (süngü, çiplak)

**Tore:** Wêje, edebiyat

**Têgîn:** Terîm, mefhûm (kavram)

**Xedeng:** Tîr, neşter

**Xwerist:** Siruşt, xweza, tebiyet

**Zende:** Îbret

## Stêrka Sor

Navê min guherandin  
Ji nav stêrkan anîn xwarê  
Qediabûn zarokên agirî  
Û bédeng mabû çar aliyên min  
Qijilî xwîna min  
Di nava dilê min de  
Bûm birûsk  
Di navbenda Dicle û Feradê de  
Asûman li ber erdê çok da  
Ro za li hemberê tariyê  
Ne yek, ne dudu bi hezaran za  
Zarokên agirî  
Dîrok, navê wî danî  
Stêrka Sor  
Rivîna agirê wî gihîşt  
Stêrkên ku vemirbûn  
Ji nû ve veketin

Sal hezar û nehsed û heştê û çar  
Zarokên agirî  
Bû bager, bahoz û moyraz  
Êrîş dikin ser tariyê  
Li bakur, li başûr  
Li rojhilat û li rojava  
Dibirîqe li esman, Stêrka Sor  
Xweş awaz e  
Tîne dide cemedê  
Dihele û diherike  
Gure gura Dicle û Firatê ye

**Rotinda**



Grevên birçîbûnê didomin. Girtî sedemên vê wiha diyar dikin:

## 'Li benda mirina me ne'

**Navenda Nûçeyan-** Li girtîgeha Diyarbekir greva birçîbûnê meha 3'yan li dû xwe hişt. Ji girtiyan 200 jê bi dorvegerî. 91 jî bêdawî di grevê de ne. Di nav girtiyan de nexweşînên girîng peyde bûne. 6 jî girtiyan di rewşeke xedar de û bêyî ku bêne tedawîkirin grevê didomin. Hevdiştinên ku di nav Rêveberiya Girtîgehê, Komeloya Mafên Mirovan û Serdozgerê Komarê de didomiyên bêtê encam man. Li ser vê yekê girtî dan xuyan ku, dewlet li benda mirina wan e.

Li Girtîgeha Diyarbekir, greva ku piştî êrişên hêzên girtîgehê di 3'yê Sibata de dest pê kiribû, meha 3'yan li dû xwe hişt. Weke tê zanîn, piştî firarên ji Girtîgeha Newşehîrê, li hemû girtîgehan li hember girtiyên siyasî êrişek bi gîştî dest pê kiribû û hemû mafên girtiyan ku bi têkoşîna salan bi dest xistibûn ji wan hatibû standin. Li ser vê yekê jî, li nêzîkî 10 girtîgehan grevên birçîbûnê dest pê kiribûn. Di van 3 mehên dawî de, ji bilî girtîgehên Mûşê û Diyarbekir, li girtîgehên din, bi hevdiştinên rayedarên dewletê û nûnerên girtiyan mafên girtiyan, li wan vegevandibûn û grev rawestiyabûn. Lê, li girtîgehên Diyarbekir û Mûşê, rayedarên dewletê xwe bi tu awayî nêzî çareserkirina pirsê nekirin û girtî jî dev ji grevên xwe bernedan.

Di vê pêvajoya grevê de, di nava girtiyan de nexweşîn belav bûn. Niha gelek girtî bi nexweşînên giran ketine û tedawî nabin. Ji girtiyên ku rewşa wan giran in, Îzzettîn Sevîlgen, Îsmail Kaçar, Zakir Sütçü, Hasan Pinar, Refîk Çelebî, Hüseyîn Karahan û Yusuf Aslan qirhe (ji madê wan xwîn herikiye) bûne. Nexweşînên mîna jana zirav, tifo, zerik û hwd, di nava girtiyan de gelek tene ditin.

Dijberiyên ku girtî û rêveberiya girtîgehê li ser li hev nakin, di çend xalan de asê ma-



Malbatên girtiyan bi zarokên xwe re di berxwedanê de ne.

ye. Rêveberiya Girtîgehê daxwaza girtiyan a nûneriya siyasî napejirîne û ev yek jî dike ku grev dirêj bibe. Wekî din girtî daxwazên xwe di 17 xalan de tesbît kirine:

1-Tesbîtkirina nûneriya siyasî. 2-Vegerandina daktîloyan li girtiyan. 3-Serbestbûna mêvandariya di nav qawîşan de û çalakîyên sporî. 4-Ji heftiyê carekê û rojek bi temamî, ji bo hevdiştina bi malbatan re. 5-Bi Evûqatan re hevdiştina bi serbestî. 6-Dema girtî bixwazin, guherandina qawîşê. 7-Li mehkemeyan bi serbestî xweparastina mehkûman. 8-Di çûn û hatina mehkeme û nexweşxaneyan de, rawestandina

lêdan û îşkenceya leşker û polîsan. 9-Dawîlêanîna îtirafkariyê ku bi zorê bi girtiyan didine kirin. 10-Li ser hevalên ku tene tehlîyekirin, dawîlêanîna lêdan û îşkenceya polis û leşkeran. 11-Di lêgerînan de, rawestandina îşkence, dizîn û şikandina eşyayên girtiyan. 12-Tedawîkirina girtiyên ku diçine nexweşxaneyan û rakirina cihên tecrîtê. 13-Pakkirina xwarinê. 14-Peydakirina pêdiviyên qawîşan (Firaq, mase, cihê cilşoyê, pirtûkxane, televizyon û hwd.). 15-Ji bo girtî dikaribin bi malbatên xwe re bi axivin, anîna telefonê. 16-Mafê hevdiştina vekirî. 17-Ji bo paceyên qawîşan asprator.

## 'Em we dawetî edaleta PKK'ê dikin'

Mehkemekirina 3 gerîlayên ARGK'ê ku roja 31'ê Tîrmeha 92'yan li gundekî Pirrînê (Adiyamanê) hatibûn girtin, li Dadgeha Meletê qediya.

Di salona dadgehê de gerîlayên ARGK'ê bi qincên gerîla parastina siyasî kirin. Di parêznameya xwe de bi kurtî wihâ gotin: "Hûn bi artêşa xwe ve bi ser me Kurdan ve digirin û me dipercîqînin. Hûn helwesteke dagirkirî diyar dikin. Bi

gotinên wek Kurd tun in, herkes Tirk e" hûn derewên herî mezin dikin. Hîna ku wext heye em we dawetî edaleta PKK'ê dikin. Em şervanên ARGK'ê ne. Em dixwazin statuya êsîrê cengê ji me re bê naskirin. Edaleta herî mezin a PKK'ê ye. Hûn me bi endambûna PKK'ê daraz dikin. Lê em şervanên ARGK'ê ne. Em hîna ne gihiştine şerefa endamiya PKK'ê."

Di dawîya darazdinê de, dadgehê cezayê mûbet da dilên ji ARGK'ê. Li hember vî cezayî dilên ji PKK'ê Nofa Bakir, Şerîf Ertan û Sidik Almakçi, dadgeh protesto kirin. Sloganên wek "Bijî ARGK, Bijî Serok Apo, Bijî Kurdistan" avêtin û li xwe dan ku ji salonê dervevin. Hingê jendermeyan jî êrişî ser dilan kir. Li ser vê bûyerê girtiyên din jî dadgeh protesto kir û demeketin dadgehê.

## HAWAR

Dilbixwîn

### Aştî bê azadî nabe...

"... Ez hîna jî tenegehîştîme, ji bo çi gelên cîran û yên cîhanê me şaş fêhm dikin? Ji bo çi naxwazin me nas bikin? Ji bo çi naxwazin bi derd û kulên me bihesin? Gelo, ma em jî ne layîqî mirovahiyê ne? Wê çawa bi milyon gel bikaribe bê welat jiyan bibê? Wê hedara wî di bin dagirkeriyê de were....?" Di hevpeyvîneke xwe de mamosteyê mezin Osman Sebrî bersiva pirsê "Hûn çi ji dijminan dixwazin?" dide. Lê weke hûn dibînin, bersiva pirsê bi çend pirsan dide, di nava tîpên wan hevokan de bersivên gelekî heja hene ku di vê pêvajoyê de jî cihê gelek valabûnan dadigirin.

Weke neteweyekê em çi dixwazin? Rijandina xwînê, lê hildana alaya azadiyê?

Xwîna me bi me gelekî şîrîn e. Canê me ne erzan e. Mîna her mirovekî ku di nava civaka mirovahiyê de jiyan dibe, em nîrx û rûmeteke mezin didin hebûna xwe. Jiyan ji bo me peywireke (wezîfeyê) mezin e, barekî giran e. Ji bo ku em xwedî li wê wezîfeyê derkevin, hemû zor û zehmetiyên didin pêşîya xwe, ji ber ku di vê dinyaya

**Bila dinya me rast nas bike. Em ji bo ku xwe bidin kuştin nehatine rûyê vê zemînê. Em ne ji bo bindestiyê hatine, ne ji bo koledaran, ne ji dagirker û mêtîngeran... bawer bikin em ji bo jiyanekê azad û serbixwe li vê cîhanê bûne mêvan. Eger ew azadî nebe para me jî, hengê tu mane ji hebûna me re tune ye.**

de ku kesek xwedî lê dernakeve jiyan bi gorikirina jiyanê tê parastin, cihê mixabinê ye!

Naxwazin me rast nas bikin. Çi ças em rastiya xwe eşkere dikin û nîşan didin, wê rastiye berevajî dikin û me mîna kesên xwînrej, mirovkuj û terorîst didin raberkirin. Gelo, wê çawa derew bikaribin rastiyan veşêrin? Wê çawa

dîrok rûyê xwe-reş bike û mirovperweriya me li ser sînga xwe nenivîsîne? Ew ças cegerdar be! Bawer nakim.

Ne tenê ji bo ku xwîn were rawestandin. Ne tenê ji bo ku rê li şehîdbûnê were girtin.... Em di serî de ji bo azadiyê, aştîyê dixwazin. Bi her awahî azadî. Azadiyeke fireh ku hemû aliyên jiyanê di hembêza xwe de veşêre.

Ji bo me tenê wateya azadiyê cihê xwe nagire. Çiyayên me jî azadiyê dixwazin. Gul û nêrgiz, şalûl û bilbil, çivêk û kevokên me jî azadiyê dixwazin....Pêlên çem û cobarên, kaniyên di bin zikê zinaran de, tîrêjen ku di berbangê de ji nava çavên rojê tenê der... Hebûn tev azadiyê dixwaze, em ne layîq in?

Bila dinya me rast nas bike. Em ji bo ku xwe bidin kuştin nehatine rûyê vê zemînê. Em ne ji bo bindestiyê hatine, ne ji bo koledaran, ne ji dagirker û mêtîngeran... bawer bikin em ji bo jiyanekê azad û serbixwe li vê cîhanê bûne mêvan. Eger ew azadî nebe para me jî, hengê tu mane ji hebûna me re tune ye.

Bila kesek xwe kor neke, xwe kerr neke.... Me bibînin, dengê me bibîhsin, em tenê azadiyê dixwazin. Gelo çil milyon insan wê çawa bikaribe bê azadî jiyan bibê?!

Ji bo azadiyê aştî jî riyek e. Lê fêmkirina aştîyê zor e, her kes nikare rastiya wê fêhm bike. Ji lew re car caran zor dibe ruhê aştîyê. Ev neh sal in, em li hemberî dijmin zora şoreşgerî bikar tînin. Di van neh salên şer de, me çend gav ber bi mirovahiyê ve avêtin, me xwe parast, parastin jî mafê me ye. Bi wê hêzê ev e, em kevokên spî bi firan dixin û strana azadiyê bi banga aştîyê re dixwînin.



# Filîstînî vedigerin welatê xwe



## Beregovoy xwe kuşt

Serokwezîrê Fransa yê berê, Pierre Bregovoy roja 1'ê Gulanê berekek berda mejiyê xwe û pê mir. Mirina Pierre Bregovoy li Fransa bû sebebê xemgîniyekê. Weke tê zanîn di meha Adarê de Pierre Bregovoy ê sosyalîst li hember muhefezekarên Fransayê di hilbijartinê de tîk çûbû û ji serokwezîriyê ketibû.



Filîstîniyên ku bi salan ji welatê xwe dûrxistî, hêdî hêdî vedigerin welatê xwe. Di wêne de 30 Filîstîniyên ji sirgunê vedigerin, tîk xuyakirin.

**Nûçeyên Derve-** 30 kesên Filîstînî ku ev bi salan e ji welatê xwe hatibûn dûrxistin û li Yordanê (Urdûnê) dijiyan. Heftiya çûyî bi rêdana Îsraîl vegehin welatê xwe. Di sala 1967'an de 1700 Filîstînî ji aliyê Îsraîl ve ji welatên xwe hatibûn

derxistin.

Vegehin van Filîstîniyên sirgunkirî bû sebebê kêf û şahiyêke pîrî çû. Bi def û zirne, bi govend û stran ev kes jî aliyê hemwelatî û mirovên xwe ve hatin bixêrhatîkirin.

Filîstîniyên sirgunkirî jî di

destê wan de wêneyên Yasser Arafat bi sloganên wek, "Em bi xwîn û can bi te re ne Abu Amar (pêşnavê Yasser Arafat)" li ser otobusekê ketin nav welatê xwe.

Di hevditînên fermî yê navbera Îsraîl û Filîstîn de rayedarên Filîstîn li ser 55

kesên sirgunkirî dabûn rayedarên Îsraîl. Ji vê listeyê tenê 30 kes hatin hiştin ku vegehin welatê xwe. Lê ji bo destpêkê ev jesta Îsraîl wek nîşaneke ber bi başbûn û nermbûnê ve tê nirxandin.

## HEFT FILÎSTÎNÎ HATIN KUŞTIN

Li aliyê din du roj piştî rêdana vegehin 30 Filîstîniyên sirgunkirî, xeta Gaze jî aliyê hêzên leşkerî yê Îsraîl ve hate bombekirin û heft Filîstînî di vî bûyerê de hatin qetilkirin. Yek jî birîndar bû.

Qetilkirina van heft Filîstîniyan li Gaze bû sebebê tevlihevî û tansiyona bilind. Esnafên Gazeyê jî bo şîrê, dest bi grevê kirin û mezinên mizgeftan bi oparolan bangî gel kirin, da ku dest bi xwepêşandanên protestokirina Îsraîl bikin. Roja 2'yê Gulanê jî di meşeke protestoyê de Filîstîniyek hate kuştin. Li xeta Gaze tansiyona germ dewam dike.

## GOTIN



Yaşar Kaya

## Kurdistana Başûr

Ji Mehabadê vir ve, ev xewnek bû. Bêhna azadî û serfiraziyê hate pozê me. Te digot qey em ne mêvan in, em çûne mala xwe. Kurdistana Başûr ev jî salekê zêdetir e ku ji bin destê zilma Sedam derketiye. Hêdî hêdî birînen xwe dipêçin, gundên ku ji aliyê hêzên Sedam ve hatine xerakirin, ji nû ve çêdikin û herkes diçe ser mal û milkên xwe.

Her bajarekî Kurdistanê bi xwîna şehîdan hatiye şuştin. Li gundan, li bajaran gelek mirov şehîd ketine û axa xwe standine. Di şerê serhildana gel de, gelek mirov şehîd ketine. Em vî carê nenas bûn. Lê, dîsa jî em li gelek bajar û cihan geriyên. Me Silêmanî, Erbil (Hewlêr), Keysincaq, Rania, Zaxo, Duhok û Şeqlawaya dit. Axa Kurdistanê gelek bi xêr û ber e, bi gul û sosin e; ava ku li başûrê Kurdistanê heye, li tu welatî tune, her çih bi kanî û zem e.

Em li Silêmanî çûne ser merqeda Şêx Mehmûdê Berzencî. Merqed û

camî tevî hev e. Minareya mizgeftê, ne dişibe mîmariya Îslamê, ne jî dişibe mîmariya tu ol û dîn ên din. Radyo û televîzyon hem li Silêmanî, hem jî li Duhok û Hewlêrê hene. Niha jî, stasyonên televîzyonê yê gelek mezin çêdikin ku ji gelek cihan dikaribe bê temaşekirin. Li serbajarê dewleta federê Hewlêrê, rojnameyên Kurdan derdikevin. Kurdistan Newe nêzikî 10 hezaran tî firotin.

Serokê Meclîsa Kurdistanê Nete-

**Ev gera me ya pêşîn bû. Dil dixwaze jin û zarok, nivîskar, rojnamevan, carna herin başûrê Kurdistanê, welatê xwe bibînin. Ji bin destê Sedam xelas bûne, çapemenî azad e, mafên mirovan hene, partî û rêxistin azad in, mîna sosyal demokratên Swêdê her tiştî tînine cih.**

weyî Namik Cewher û Serokwezîrê Hikûmetê Kusret Resûl Abdullah, ji me re derd û kulên Kurdistanê anîne ziman. Li Duhokê, li Hewlêrê me bi gelek nivîskar û rojnamevanên Kurd re axaft. Di Kurdistanê azad û serfi-

raz de, me leşkerên Kurdistanê dît. Em çûne mizgefta Laleş, me Kaniya Spî dît. Em bûne mêvanê Yêzîdiyan. Ji bo biratî û yekîtiyê, ji destê kê çî tî wî dîke.

Bêhna biratî û yekîtiyê li Kurdistanê Başûr tenê nîn e. Ji Ewropa bigirin heta Şamê, heta Mehabadê, mîna bayê serê sibehê tî. Ev dem demeke nû ye. Ev di dîroka me Kurdan de momenteke nû ye. Divê em bi qedr û qîmeta vî demê zanibin.

Li Silêmanî, em çûne ser tirba Şêx Mehmûdê Berzencî. Meqbera Şêx Mehmûd di nav mizgefteke mezin de ye. Di derê Silêmanî de, şêklê Qazî Muhammed heye. Em çûn, me di nivê Silêmanî de hêkelê Kawayê Hêsinker dît. Gelek koşk û vîlla hene li Silêmanî.

Ev gera me ya pêşîn bû. Dil dixwaze jin û zarok, nivîskar, rojnamevan, carna herin başûrê Kurdistanê, welatê xwe bibînin. Ji bin destê Sedam xelas bûne, çapemenî azad e, mafên mirovan hene, partî û rêxistin azad in, mîna sosyal demokratên Swêdê her tiştî tînine cih. Em gelek dixweş vegehiyan. Heval û hogirên ku em kirine mêvan bila zor (pîr) bijîn. Em çûbûne mala xwe.

Xweda Kurdistanê azad û serfiraz biparêze.

Xweda hafiz Kurdistan.

## Li Tacikîstanê îhlalkirina mafên mirovan

Rêxistina Efü ya Navneteweyî li ser îhlalkirina mafên mirovan yê li Tacikîstanê diqewimîn kete alarmê.

Di rapora xwe de Rêxistina Efüyê dide diyarkirin ku, ji meha Gulana 1992'yan û vir ve di şerê hundir ê navbera hêzên hikûmetê û yê mûxalefeta îslamî de, zêdeyî 20.000 mirov hatine kuştin. 600.000 kes jî, ji cihê xwe yê rûnîstî hatine dûrxistin.

Rêxistina Navneteweyî dide xuyakirin ku lazim e bi lezgîni li ser rewşa Tacikîstanê bê rawestandin da ku, rê li ber îhlalkirina mafên mirovan bê girtin.

Li gor berpirsiyarên Rêxistina Efüyê ji xeynî kuştin û dûrxistinên gelek delîlên îşkenceyê jî di destê wan de heye. Di rapora de mînak li jêr jî van îşkenceyan tî dayîn:

"Deh mirovên bi îşkenceyan laşên wan hatibûn parçekirî û daxkirî anîne morgê. Yek ji wan mamoste bû û qoqê mejiyê wî hatibû şeqkirin. Yê din jî an milên wan hatibûn şewitandin an jî guhên wan û hwd. hatibûn hilkirin."

Berpirsiyarê Rêxistina Efüyê vî rewşê wek trajediyekê dinirxînin.



## Yeni Ülke ceza stand

Rojnameya Yeni Ülke, piştî girtina xwe ji, ji ceza û pêkûtiyan xelas nabe. Berpirsiyarê Nivîsaran yê Yeni Ülke Bülent Aydın, roja 3'ê Gulanê di DGM (Dadgeha Ewlekariya Dewlethe) a Stenbolê de, 5 meh hepis û 117 milyon LT ji ceza girt. Ev dawê li ser 2 nivîsên di hejmarê 111'an de hatibû vekirin. Li gor dozger, bi van herdu nivîsan propagandaya PKK'ê hatiye kirin. Li hember vê îdiaya dozger, Berpirsiyarê Nivîsaran ê Yeni Ülke Bülent Aydın da xuyan ku, armanca wan agahdarkirina xwendevanan a li ser bûyeran û PKK'ê ye û di vê dema şerrawestîne de, herkes dîtînen xwe bi awayekî vekirî pêşkêş dike. Lê tevî vê parêznameyê ji, biryara dadgehê ji bo cezakirina Yeni Ülke bû û ev ceza, ji bo Bülent Aydın 5 meh hepis û 117 milyon LT ji pere hate tesbîtkirin.

## Ha binçavî ha windabûn

Weke li Kurdistanê tê meşandin, li metropolên Tirkiyê jî, li hember hêzên sosyalist û demokrat, pêkûti û zilma dewletê gihîştîye radeya dawî. Roj derbas nabe ku bi ser malekê ve negirin û çend ciwanan nekujin, an yek di binçavîyê de winda nebe, an neyê kuştin.

Hêzên polîsî, bi taybetî li bajarê Stenbolê bi metodên kontr-gerîla bi ser hêzên sosyalist û demokrat ve diçin. Kesên ku têne girtin demeke dirêj tu agahî ji wan nayê standin û gelek caran jî, polîs van binçavîyan înkâr dikin. Dû re jî, bi tu awayî ji kesên binçavkirî tu agahî nayê girtin û winda dibin.

Li Stenbolê, beriya 1'ê Gulanê jî gelek kes ji aliyê polîsan ve hatibûne standin. Pirraniya van kesên binçavkirî derketin dadgehê û hin hatin berdan hin jî sandin girtîgehê. Lê 2 kesên binçavkirî hebûn ku polîs van binçavîyan înkâr dikir. Ev herdu kes, İbrahim Güven û Abbas Yalçın, beriya 1'ê Gulanê bi rojekê hatibûne girtin. Lê tevî hemû lêgerînan lêzîmên wan, polîs van binçavîyan înkâr dikir. Piştî 5 rojên binçavîyê polîs binçavkirina İbrahim Güven qebûl kir lê hê jî, ji Abbas Yalçın agahî nîn in. Malbata Abbas Güven, ditirsîn ku lawê wan jî aliyê polîsan ve hatibe kuştin û ji ber vê yekê binçavkirina wî tê înkarkirin.

Li gor rewşa îro, wisa diyar e ku, dê windabûnên di binçavîyê de hê demeke dirêj jî bidomin. Lewre, dewlet bi giştî di destê hêzên leşkerî û polîsan de ye û bi tu awayî kes nikare ji wan pirsra vê zilmê bike.

# Polîs êrişî ser beşdarên cenazê kir

**Navenda Nûçeyan-** Polîs êrişî beşdarên merasîma cendeka Şengül Yildiran kir, 25 kesan girt. Di vê bûyerê de rojnamevan jî, ji lêdana polîsan bêpar neman, makîneyên wan hatin şikandin û dest li ser fotografên wan hate danîn.

Di dema binaxkirina cendeka Şengül Yildiran de, di 4'ê Gulanê de, polîs bi mebesta ku çek li hemberî wan hatine teqandin êrişî ser beşdarên merasîma cendekê kirin, ji beşdarên 20 kesan girtin binçav. Di vê navê de rojnamevanên ku bûyerê dişopandin jî, ji vê êrişê para xwe standin. Ji rojnameya Meydanê Ümrân Aras, ji rojnameya Türkiye Mehmet Beytül, ji rojnameya Sabahê Ahmet Uçar, ji rojnameya Mücadele Cevdet Algül û ji rojnameya Aydınlik Mustafa Çetinkaya bi lêdan û kotekî hatin binçavkirin, makîne wan hatin şikandin û dest li ser fotografên wan hat danîn.

Şengül Yildiran û Uğur Yaşar Kiliç di 30'ê meha Nisanê de, li navçeya Kadıköy a bajarê Stenbolê di mal de, ji aliyê polîsên girêdayî Emniyeta Stenbolê ve hatibûn kuştin. Ev her-



Di înfazê bêdarazî de heta niha nêzîkî 60 şoreşger kuştine.

du kuştî xwendevanê zanîngehê bûn.

Ev bûyer ji aliyê çapemenî û TV'yên Tirkiyê ve wek operasyonek hatibûn dayîn û ev herdu kes wek di lihevxiştîne de hatibin kuştin, li serê hatibû ra-westin. Lê li gorî didevanê bû-


yerê û lêzîmên kuştîyan ev bûyer jî wek bûyerên înfazî hat nîrxandin.

Kuştîyên vê bûyerê wek dilxwazên Devrîmci Sol'ê û xwendevanên zanîngehê hatin hêjandin.

Ji hengê ku hikûmeta koa-

lisyonê ya DYP û SHP hatiye ser kar cinayetên bi vî cureyî hîn bêhtir zêde bûn. Li Kurdistanê cinayetên "failê meçhul" û li Tirkiyê jî cinayetên bi rengê înfazê di rojev û bernamaya vê hikûmetê de cihê xwe girtin.

## Du berendamên serokkomariyê: Demîrel û İnan



Kamran İnan

**Navenda Nûçeyan-** Kursiyê Serokkomariya Tirkiyê ku bi mirina Turgut Özal vala bûbû, li Tirkiyê bû sedemê krîzeke nû. Lewre hê jî roja pêşîn Serokwezîr Süleyman Demîrel jî bo serokkomariyê dest bi xebatan kiribû û bêyî ku destûr ji partiyên din bistîne berendamîya xwe, ne bi awayekî fermî be ji îlan kiribû.

Ev yek di nav partiyên din de, bi taybetî jî di nav şîrkê koalîsyonê SHP'ê de, nexweşiyên mezin peyde kir. SHP heta roja dawî jî, destekê neda Demîrel ku dikaribe berendamîya



Süleyman Demirel

xwe ya serokkomariyê îlan bike. Partiyên din jî, li hember Demirel kampanyayek vekirin û ji bo li derveyî DYP'ê, di nav xwe de berendamêkî tesbît bikin xebat meşandin.

ANAP, piştî ku Demîrel niyeta xwe ya serokkomariyê eşkere kir, serkêşiya vê kampanyayê kir. Serokê Giştî yê ANAP'ê Mesut Yılmaz, bi rexneyên tûj bang li Demîrel kir ku dev ji vê niyeta xwe berde û berendam, bi hevnerînekê (konsesyusekê) di nav partiyên de bê tesbîtîkirin. Lê tevî hemû xebatên ku hatine kirin, li ser

berendamêkî din, di nav partiyên din de lihevhatinek çênebû û ANAP berendamê xwe îlan kir. Berendamê ANAP'ê mebûsê Bilîsê Kamran İnan e. Li gorî ku di nav siyasetvanan de tê şîrovekirin, sedemê ku ANAP Kamran İnan wek berendam îlan kiriyê Kurdbûna wî ye. ANAP bi vî awayî dixwaze li gor siyaseta dewletê ya li derbarê Kurdan de, navê yekî Kurd derxe pêş û bi vî awayî jî, rastiyan binixême.

Partiya Necmettin Erbakan Refah jî, ji bo serokkomar ji aliyê gel ve bê hîlbijartin, pêsnî-

yareke nû anî. Li gorî Erbakan, ger serokkomar ji aliyê gel ve bê hîlbijartin, dê çêtir bibe. Ev pêşniyar tu alîgir nedîtî. Lê Erbakan jî bo vê pêşniyarê bide pejirandin kampanyayên xwe bi serdan, mitîng û hevdiyanan ve dimeşîne.

Alparslan Türkeş, ku Serokê Giştî yê MHP'ê ye, destekê dide Demîrel û dibêje, "Em bi her awayî bi Demirel re ne."

Partiya Deniz Baykal CHP, ji bo destekkirina Demîrel hê bêbiryar e. Ecevit li hember vê berendamîyê derdikeve û destekê dide Kamran İnan. Partiyên mayîn jî, ji bilî HEP'ê di navê de ne.

Partiya Keda Gel (HEP), li gorî ku dixuyê, dê Demirel destek bikin, lê bi hin şertan. Süleyman Demirel jî bo desteka HEP'ê bistîne, hê jî roja pêşîn ve, bi navberiya hin kesan dest bi danûstandinan kir.

Süleyman Demirel, piştî ku sozê destekê ji SHP'ê girt, di roja 4.5.1993'an de berendamîya xwe bi awayekî fermî îlan kir. Li gor rayên DYP û SHP'ê, wisa xuya dike ku, dê Demirel, ji aliyê pirraniya rayên mebûsan ve bê hîlbijartin û dê ev ray ne zêdeyî 230'yî bin.



# Li Skandînavya gelekî bindest: Samî

## Gavan Koçer


Li Bakur bi navê Samiyan gelek diji. Ev gel gelê Bakurê ê kevntirîn e. Ji bo vê yekê ye, jê re gelê xwecihî tê gotin. Welatê wan "Sameland" di nav Norwec, Finlandiya, Swêd û Rûsyayê de hatiye parvekirin. Ta 30-40 sal berê, ziman û çanda wan jî qedexa bû. Siûda wan û yê Kurdan, jî gelek aliyan ve dişibe hev.

Lê kolonyalistên wan wek ên me ewqas nebûne hov. Ji bo ku gelê me vî gelê bindest jî nêzik ve binase, me bi navê Welat bi Serokê Meclîsa Samiyan Profesora Filolojîyê **Ole Henrik Magga** re hevpeyvînek çêkir.

*Ji gelek aliyan ve siûda Samiyan dişibe ya Kurdan. Welatê Samiyan hatiye parvekirin û Samî nikarin li ser çavkaniyên xwe bibin xwedî bîyar. Li ser vê yekê hûn dikarin bi kurtî dîroka Samiyan bi me bidin nasandin? Sedema jihevketina Samiyan a dîrokî çî ye?*

Dîroka Samiyan bi kurtî dîroka mêtînghekarîyê ye. Hê di destpêka çerxa-navin de, welatên ku li der û dorê me bûn, dest bi talanî û bazirganiyê kirin. Ev heta xwestina bacê (vergîyê) jî çû. Ji vê pê ve sînoren welatê me jî aliyê melîkên (kong) biyanî ve hatin nîşankirin. Her melîkek hinek erdê me, xist destê xwe. Wan ew destxistina erdê me li gor hêza xwe ya şerê ku li herêmê bûn, mafê xwe diditîn. Me jî bo parastina xwe nema çek bi kar anîn. Gelê Samiyan jî dîrokê xwe ve, gelekî aştîxwaz e û xwedî toreyên şerî nîn e.

Welatên dagirker, bere bere xwe xwediyê welatê Samiyan "Sameland" ditin, ne tenê serwer. Lê xwedî erdê jî. Dewleta Norwecê jî, ji sala 1775'î bi sîn ve xwe xwedî welatê me dit û dest bi firotina erdê me kir û dewlemendiya wê da welatên dagirker ên Başûr. Ji 1850 ta 1950, Norwec ceribandina ji holêrakerina çanda Samiyan kir. Di vê periyodê de çanda Samiyan derbên xedar girtin. Ev politîka hanê, van 10-20 salên dawî xwe guhert. Lê hê jî ne vekirî ye



**Ole Henrik Magga: "Qaydeyê ramandina Samiyan zêdetir ji sebr û aramiyê pêk tê. Li ba me, ramana li ser erdê (axê) toreyeke (adeteke) kevn e. Ew mala herkesî ye û kesek nikare bibe xwediyê wê. Ev toreyaya han, karê kolonyalîstan hêsantir kir. Me tu car bawer nedikir ku, mêvanên vê derê rojek bibin xwedî ew tiştên ku kesek nedikaribû xwedî bibe, yanê erd û avê."**

ku di Sameland de kî xwedî erdê ye. Ev pirs niha di bin guftûgoyan de ye. Niha me organên xwe ku jî aliyê gel ve hatine hilbijartin û dikarin doza mafê xwe bikin, pêk anîne. Van dezgehan ta radeyek jî aliyê qanûnên neteweyî û navneteweyî ve jî tîstî parastin.

*Wek ku tê zanandin zimanê gelê Samî jî hêla dagirkeran ve bi awayekî hişk hat pestandin û rê li pêşveçûna wî hat girtin. Gelo we ew rewşê çawa derbas kir û we jî bo afirandina zimanekî hevpar ê gelêrî çî kir û çî dikin? Hûn pirsgirêka diyalektan-Samiya bakurî, Samiya başûrî-çawa çareser dikin? Hûn jî hev fêm dikin? Bi herdu diyalektan tê nivîsandin?*

- Di welatê me de, bi pêşveçûnê pest û pêkûtiyên dagirkeran ve zimanê me derbên xedar girtin. Rê li pêşveçûna zimanê me hat girtin. Niha li Norwec û Swêd em xwedî sê (3) zimanê nivîsandinê ne. Cûdabûyîna diyalektan ewqas mezin bûye ku, xebata afirandina zimanekî hevpar ê nivîsandinê hê jî bi ser neketiye. Bi baweriya min di warê nivîsandinê de, li Norwec û Swêdê jî du zimanên nivîsandinê zêdetir ne hewce bû. Ji wan yek jî bo Samiyên bakur û Lulesamiyan û yê din jî, jî bo Samiya başûrî. Îro li Norwecê em xwedî du sazûmanên zimanî ne. Yek jî wan dezgeha zimanî ye û erka wê pêşvebirina zi-

manê me ye, yê din jî organa kontrolê ye û çavdêriya zimên girîyê ser xwe. Herdu jî, bi her alî ve û bi awayên cûda paralel dixebitin ku zimên pêşve bibin.

*Di dinyaya çandê de Samiyan "stêrkên" mezin, wek rejîsora filmê Nils Gaup û bi joikên xwe stranbêj Marî Boine, derxistin holê. Gelo hûn dikarin ji me re taybetiyên çand û joika Samiyan şîrove bikin?*

- Çanda Samiyan, çanda rengan û çanda forma îfadekirinê ya xwezayî ye. Joik (muzîka Samiyan a gelêrî ye) muzîka rojane ye û ji xwe re mijarên ku der barê mirovan, lawiran, cih û serpêhatiyên e, bingeh digire. Ji aliyê muzîkalê ve muzîka me, jî yê Ewropîyan cûdatir e. Di muzîka me de navberên sabit nîn in, lê ton jî cihê dilivîn cihê din. Ji bo vê yekê ye ku, ez dixwazim bibêjim forma çanda Samiyan gilover e. Lê çanda Ewropîyan xwedî quncikên tûj e- bi awayeke din zêdetir çarkeşeyî ye.

Qeyda ramandina Samiyan zêdetir ji sebr û aramiyê pêk tê. Li ba me, ramana li ser erdê (axê) toreyeke kevn e. Ew mala herkesî ye û kesek nikare bibe xwediyê wê. Ev toreyaya han, karê kolonyalîstan hêsantir kir. Me tu car bawer nedikir ku, mêvanên vê derê rojek bibin xwedî ew tiştên ku kesek nedikare xwedî bibe, yanê erd û avê.

*Li Norwecê meclîsek we heye*

ku, fonksiyona wê şîret (şewre) e. Yanê bi tenê ditinên xwe dibêje. Lê li gor ku, mirov dibihîze edî Samî dixwazin meclîsa wan bibe mekanîzmaya biryaran. Di vî warî de ditinên we çî ne? Li hemberî vê xwestina we muxalefeta rayedarên Norwecê çawa ye?

- Derfetên biryargirtina Meclîsa Samiyan her roj zêdetir dibin. Niha pirraniya doliwgeriya (îdara) karên çandê ketiye destê me. Hin bi hin em dixwazin doliwgeriya erd û bazirganiyê jî bixin destê xwe. Lê ev karê han, giran diçe û ji aliyê din ve jî berxwedana dewleta Norwecê heye. Lê li hemberî her tiştî, karên me jî 10-20 sal berê baştir û di atmosfereke xwestir de derbas dibin.

*Neteweyên Yekbûyî (NY) sala 1993'an kir sala gelên xwecihî. Hûn biryara NY çawa dibînin?*

- Em bawer in sala gelê xwecihan (niştichên esas) wê di civaka dinyayê de Samî û xwecihên din bide nasandin. Di prensîbê de ev prosesa ku Sameland û Amerîka dagirker yek e, dibe ku ev sal jî bo pêkanîna zagoneke (qanûnekî) navneteweyî, ku mafên gelên bindest diparêze û dewletan dike xwedî berpirsiyariyê, tesîra YN (Yefitiya neteweyan) û hikûmetan bike. Divê em di YN'ê de jî bo sistemekê kar bikin da ku, li wir gelên bê dewlet jî bîstî temsilîkirin. Li vir divê em bala xwe bikişînin


ser prensîbên konvensiyona YN'ê ku di sala 1966'ê de der barê mafên civak û politîkî de hatine nîşankirin. Li wir bi awayekî vebirî tê gotin ku, hemû gel wekhev in. Ê ku di pileya (dereceya) yekemîn de vî karî bi cih tîne YN bi xwe ye.

*Dinya me di bin problemên globalî de diheje. Çavkaniyên xwezayê jî bo serûbinkirina gerdûnê tîstî bikaranîn. Pirraniya kavit û wêrankirinê jî digihîje welatên ku ji berê ve, bi awayekî hovane dihatin pestandin. Wek Kurdistan. Niha li YN'ê hûn gelê Samî temsil dikin. Li ser vê pirsgirêkê stratejiya we çî ye?*

- Ji bo pêşvebirina ramanekê, ku bikaribe li dijî nexweşiya qezencê ku li Rojava peyde bûye û di radeya xerakirina gerdûna de ye, nûnerên me bi gelên bindest û mînorîtetan re dixebitin. Ji bo vê em beşdarî xebatên navneteweyî dibin. Di vî warî de xebata me bi hikûmetên Skandînavî re jî heye. Ji bo ku YN rewşa gelên bindest cidî bigire, konsîla dinyayê ya ji bo gelê xwecihî (WCIP) xebatekî westî dimeşe. Hilweşandina xwezayê zêdeyî zirarê dide gelên ku girêdayî xwezayê ne. Di vî wateyê de parastina xwezayê parastina gelên bindest e.

*Gelê Kurd dixwaze xwe nêzi gelê Samî bike û bibe dost. Ji bo afirandina tîkiliyêke wiha rojnema Welat dikare bibe pîrek. Ji bo gelê Kurd, ku iro di bin hoyên bêmirovatiyê de, berxwedana jiyana xwe dide, banga we çî ye?*

- Divê em tîkoşîna xwe bajon û alîkariya hev bikin. Me piştgiriya tîkoşîna gelê Kurd kiriye û emê bikin jî. Em di nav herdu gelan de lêzimtiyêke nêzik seh dikin. Ji ber ku welatê me jî wek yê wan hatiye parvekirin. Divê dinya ev bêmaftî û zordestiya ku, li gelê Kurd bûye û dibe, bibîne. Em we jî bir nakin. Ez bi xwe û Meclîsa Samiyan emê di her derfetê de tîkoşîna we ya bi heq palpiştî bikin. Herçend dagirkerî wek fizîkî bi hêz be jî, ew dê tu caran nikaribe manewiyat û rihê me biskîne.



Samiyên ku li kersaxa Oqyanûsê dijîn, ji wan re "Samiyên Oqyanûsê" tê gotin.



Di wêneyê de Samiyên masîgir, dema ku masiyan bi torê jî binê qeşemê digirin tîstî ditin.





Hin tişt hene ku di pirtûkan de nehata-  
tine nivîsandin, di nav jiyane de mirov  
wan hîn dibe.

Musa Anter

# Kurmên me ji me ne

"Kurmê darê ne ji darê be, dar  
rizî nabe"

Mirov dibêje qey pêşiyên me  
ji. ji xiniztiya nav xwe hay he-  
bûne. Jixwe gotinên pêşiyên, ji  
rastiya mercên civakî hatine  
der. Ev gotinên bi şîret, ji bo  
nişên nû peywira cerbînê (ter-  
cûbeyê) bi cih tinê. Em baş ni-  
zanin ku ev gotina pêşiyên di çi  
heyamê de ketiye  
nav civaka me û he-  
ta roja îro hatiye; hê  
ji tu tiştêk li gor  
mercên me ji nave-  
roka xwe winda ne-  
kiriye.

Bi rastî civaka me  
ji aliyê xiniztî, xa-  
yintî û îxanetê ve  
gelek bi nav û deng  
e. Dîroka me bi xi-  
niztiyê jî dagirtiye.  
Tew, telîsê diroka  
me ya xiniyê bi-  
dewsîni jî tê de bi  
cih nabin. Dijmin tu  
car bi hemû heza  
xwe ve jî me, tîk  
nebiriye. Bi dek û  
dolap, bi fen û fu-  
tan, bi kesên xiniz û

xapandî, dijmin em tîk birine.  
Ango doza me, tîkoşîna me,  
serhildanên me ne ji derve ve,  
lê belê ji hundir ve tek çûnê, şî-  
kiyane.

Ev rewşa me ne bi tenê ji bo  
parçeyekî welat, ji bo başur,  
bakûr, rojhilat û başurê rojava jî  
wisa ne. Lê ezê li ser xinizê me  
yê li bakurê welat rawestim.

Minakên xwe ez ji dîroka dîr ji  
hilnabijêrim, ji dîroka nû, vê de-  
ma ku em tê de ne. Ev kes di  
mewkiyên dewletê de cih digi-  
rin. Mirovên payebilind in.  
Xwenda ne ji xwe re bûne mi-  
rov. Çirokek heye. Tam rewşa  
van kesan tîne zimên. Ezê bi  
kurtî binivîsim. Zilamek hebû-  
ya, bavê wî tim jê re gotiye.

De vêca em werin ser xiniz  
û celadên xwe yên bi nav û  
deng. Yek ji van xinizan beren-  
damiya xwe ji bo serokkomarti-  
ya Tirkiyê daniye. Kamiran  
Înan. Ev kes ji Bilîsê ye. Ka-  
likên wî ji bo Kurdistanê serî li  
hember dewleta Osmanî rakirî-  
ne; wî jî, ji bo komara Tirk ze-  
xim bike û li ser piyan bimîne ji  
dil û can xwe daye  
xebatê. Tew dixwa-  
ze bibe serokkomar  
jî ku vêca bibêjin  
Kurd doza çi dikin  
heyra? Binêrin tu ci-  
hefî di navbera Kurd  
û Tirkan de nîn e.  
Tirk bibin çi Kurd jî  
dibin.....

Na wele ne rast  
e. Kurd ji Tirkan  
bêhtir li Komara  
Tirk xwedî dertên, jê  
re canê xwe bi gorî  
dikin. Hûn bawer  
nakin ne? Ha ji we  
re çend nav ji xwe  
re li serê têr bifikirin.  
Wezîrê Karê Hundi-  
rîn Îsmet Sezgîn  
(Kurdek sirgûnkirî).

Wezîrê Karê Derveyî Hîkmet  
Çetîn (Bi gotina Apê Mûsa  
qewmê kewê), Kamiran Înan,  
(Kordundeyê me) Wezîrê Karê  
Xebatê Mehmet Moğoltay,  
Necmedîn Cevherî. Ev bes in,  
lewre kesê ku ji hindikî fêm ne-  
ke ji pîrî qet fêm nake.

Zana Farqînî



"Tu nabî mirov." Zilamê me  
serê xwe hilaniye çûye. Ji xwe  
re xwendîye û di cihek mezin  
de dest bi peywira xwe kiriye.  
Pişt re bi kotek û zorê bavê  
xwe aniye cem xwe. Ji bavê  
xwe re gotiye: "Te digot tu na-  
bî mirov" Bav jê re. "Kerê me  
çûye seferê lê dîsa mîna kerê  
berê" dibêje.

## Jûjî...

Doğan Güzel



# TÎR

Musa Anter



## Zikat

**R**ojnameyên Tirkan bi qerf dinivîsin.  
PKK zikatê dide hev. Erê lawo, wê  
PKK zikatê bi hev de û Kurdên bi na-  
mûs jî wê bidin. Ma hûn bê zikata çi ye kerno?  
Bi Tirkî zikat vergî (bac) ye. Dibêjin rojekê eşî-  
rek Ereban hatine cem Hz. Muhemed, gotine:  
"Ya Muhemed me divê em misilman bibin." Mu-  
hemed gotiye, "Hayhay." Ereban jî gotine: "De  
ne şertên me jî hene."

-Şertên we çi ne?

-Heyran em yextiyar bûne heta vî emrî me  
ne nimêj kiriye û me ne rojî girtiye; me divê tu  
me ji van efû bikî.

-Hayhay, kengî we xwest wê çaxê bikin. Ere-  
ban:

**Wilo xuya dike ku, Apo jî ev hadîs di kitêba îmamê Qestelanî de ditiye. Lewma ji Kurdan re dibêje: "Min û Kurdistanê nas bikin û zikata xwe bidin me û bes." Yanî rojnameyên Tirkan vê ji PKK re dikin qusûrek. Ka va PKK feqîr e, muhtacê zikatê ye. Ne wilo ye lawo. Ma îsal heftê sal, hûn eyda derî bi derî digerin, eyar û roviyên qurbanê didin hev û li mekteban jî bo fitran hûn zerwan didin zarokan a we mêranî ye, lê a PKK eyb e.**

-Dora Me-  
kehê dij-  
minên me ne,  
em nikarin  
herin hecê jî.  
Hz. Muhe-  
med:

-Ew jî xa-  
tirê we, tiştê  
heye eşheda  
xwe werînin,  
yanî Xwedê  
bi rebîti û min  
jî bi pêxem-  
bertî qebûl bi-  
kin û zika  
xwe bidin û  
hew." Yanî ji  
pênc şertên  
îslamê sisê

derxistiye, hiştiye dudo.


Wilo xuya dike ku, Apo jî ev hadîs di kitêba î-  
mamê Qestelanî de ditiye. Lewma ji Kurdan re  
dibêje: "Min û Kurdistanê nas bikin û zikata xwe  
bidin me û bes." Yanî rojnameyên Tirkan vê ji  
PKK re dikin qusûrek. Ka va PKK feqîr e, muh-  
tacê zikatê ye. Ne wilo ye lawo. Ma îsal heftê  
sal, hûn eyda derî bi derî digerin, eyar û roviyên  
qurbanê didin hev û li mekteban jî bo fitran hûn  
zerwan didin zarokan, a we mêranî ye, lê ya  
PKK eyb e. Yanî bila Kurd zika xwe bidin weqfa  
Mehmetçikan û ew jî pê bomban bikin û  
bavêjin wan bavên mino. Lawo, hey hûn bê e-  
deb in, lê hema hebekî bi aqil bin kuro. Ma hûn  
nizanin ji îro pê ve, ku hûn bixwin, emê du rûyê  
we jî bidin. Ew tirtira we ya berê çû. Ku hûn ji dê  
û bavên me re xeberan bidin û em serê xwe di  
ber xwe xin. Na birako ew nema ji we re diseri-  
fe. Gotinek bi Erebi heye, dibêjin: "Emsalî kesî-  
re", yanî pirayî vegeandin. Hûn yeqîn bikin ji îro  
û pê ve çi heqereta ku hûn li me bikin, bi em-  
salê kesîre emê li we vegeandin.

5.4.1992



Di berbanga sedsala 21. de li Kurdistanê:

# 70 roj li ser hev îşkence



Îşkenceya hovane ya ku di 70 rojan de li ser gundiyan Banayê hatiye ceribandin, di dîrokê de wek rûpelek reş ji dewleta Tirk re dê bê nivisandin.

**Navenda Nûçeyan-** Di 20 û 21'ê Sibata 1993'an de, hêzên leşkerî û cerdevanên gundên dorhêlê, êrişî ser gundê navçeya Şirnexê Basê. Banayê kiribûn û hemû xanî û avahiyên Banayê bi roketan şewitandibûn. Di vê êrişê de, 2 zarok bi navên xwe Abîde Ekin (7) û Alî Yildirim (5) û hemû sewalên gund hatibûne kuştin. Hêzên leşkerî mal û hebûnên gundiyan talan kiribûn û hemû zîlamên gund bi xwe re biribûn û çûbûn.

Hêzên leşkerî, pêşî li Basesyê, di înşea qereqolekê de 15 rojan li gundiyan îşkence dikin. Li ser laşên gundiyan, bi hesinên-di agir de sotkirî, birîn û şewatên xedar peyda dikin û tiliyên dest û piyên wan, ranên wan dişewitînin, pîsî bi wan didine xwarin, bi cop û şûşeyan tecawuzî wan dikin, wan li ser berfê, di bin sifirê ya 20 dereceyê de radizînin, piştî bi 15 rojan jî, wan ji wê derê dişînin îşkencexaneyên Şirnex, Mêrdîn

û Diyarbekirê û îşkence li wan deran jî didomin.

Ev 43 gundiyan jî gundê Banayê ku li îşkencexaneyên Şirnex, Mêrdîn û Diyarbekirê hatine belavkirin, piştî îşkenceyên xedar, hin ji wan dişînin girtîgehên û yên din jî, di bin navê tedawîkirinê de, li nexweşxaneyan radizînin, lê îşkence li nexweşxaneyê jî didomin.

Ji girtiyan İbrahim Ekinçî, li Diyarbekir bi îşkencê tê kuştin. Dû re weke ku ne bi îşkencê hatibe kuştin, cendekê wî dişînin bi ser malbata wî ve. Hin ji girtiyan di îşkenceyan de piyên wan teneşeyî (kangren) bûne û ji ber vê jî hatine jêkirin. Dû re jî, di dawîya 70 rojê de, bîyî ku derkevin mehkemê, hatine berdan.

Yek ji girtiyan ku piyê wî hatiye jêkirin, li Nexweşxaneyê Diyarbekir rehîn e. Jê pereyê tedawîkirinê tê xwestin. Çendên din jî li Cizîrê xwe vedîşêrin. Ji van kesan Resûl Aslan, Nevaf Özkan, Abdulsalam

Demîr, Fahrettîn Özkan, Hüseyîn Yildirim û Şükrü Yildirim, di perîşaniyeke mezin de, di malên lîzîmên xwe de li Cizîrê ne û xwe vedîşêrin.

## GUNDÎ ÇI DIBÊJIN?

Resûl Aslan (27), di 20'ê Sibatê de ew girtine û bîyî ku derkeve mehkemeyê 70 roj di bin îşkenceyê de maye. Ji ber van îşkenceyan binê herdu piyên wî hatine jêkirin: "Roja 20'ê Sibatê em çavgirtî û bi hev re girêdayî birin Tabûra Baseyê. Bêrawestan 15 roj li me îşkence kirin. Di wê qeşema şevê de em derdixistin derve û li ser berfê bi saetan disekinandin. Em bi rojan birçî hiştin. Dema ku ditînin em ji taqet dîkevin, parçeyek biçûk nan didane me. Bi saetan bi cop, kulm û lîngan li me didan. Dema em diketin erdê, em radikirin û dibirin ser berfê. Destên me di kelepçeyê de bûn. Tevî ku di ser de 2 meh û nîv derbas bûne jî, hê cihê kelepçeyê

di milên min de kifş in. Piştî 15 rojan jî bi helikopterê em birin Şirnexê. Îşkence li wir jî her berdewam bû. Piştî bi demekê, 5 kesan jî me veqetandin û birin. Em nîzanin ka çî hatiye serê wan. Dû re em jî şandin Nexweşxaneyê Mêrdînê. Li wir cihê girtiyan hebû, lê em tev li wir bi cih nebûn. Li ser vê yekê, çend ji me şandin Diyarbekirê. İbrahim Ekin jî bi me re bû. Li nexweşxaneyê bi îşkencê hate kuştin. Em jî li ber mirinê bûn. Di milekî me de serûm hebû, milê din jî bi ranzeyê ve kelepçekirî bû. Piştî 5 rojan ji me re gotin piyên we kangren bûne. Tevî wî halê me li me îşkence dikirin û em diavêtin faleqeyê. Rojek doktor hat û reçeteyek nivîsî, lê em nikaribûn derkevin, dîviyabû ku leşker îlacên me bistînin, lê tevî ku 7 roj di ser re derbas bûn nestandin. Ji ber vê jî piyên min kangren bûn û hatin jêkirin. Ez 50 roj di nexweşxaneyê de mam, 5 rojan jî li Şirnexê mam. Em dernexistin mehkemê, îfadeyên me jî nestandin. Rojek hatin û ji me re gotin bişeqitin.

Ev zilm li me hate kirin, lewre em gelekî bindest in. Em naxwazin ku li tu derê dinyayê tiştên wiha bi serê tu gelî ve werin. Ez bawer dikim ku dê gelên bindest rojek tola xwe hilînin."

Tiştên ku hatine serê girtiyan din jî bi wî rengî ne. Piyên gelekên ji ber ku kangren bûne hatine jêkirin. Gelek ji wan xwe li malên lîzîmên xwe vedîşêrin û ji gund û warên xwe dûr bûne. Yek ji gundiyan li Nexweşxaneyê Diyarbekir, ji ber ku pere jê dixwazin rehîn maye. Li

girtîgehên Diyarbekir û Mûşê jî 9 ji van gundiyan hê jî girtî ne.

Girtiyan ku li Girtîgeha Diyarbekir in ev in: İbrahim Özkan, M. Nûrî Özkan û Alî Erbek. Li Girtîgeha Mûşê jî ev kes razayî ne: Muxtarê gund Mehmet Aslan, Şemseddîn Erbek, Osman Ekin, Hacı Ekinçî, Mehmet Özkan, Cemal Sezgin û melayê gund (ji aliyê aqlî ve nexweş e) Zekî Çetîn.

Di encamê de, 3 kuştî 43 seqet û gundekî wêrankirî li dû vê êrişê hêzên leşkerî û cerdevanan ma.

## GUNDIYAN DEWLET ŞIKAYETÎ EWRÛPA KIRIN

Li ser navê 31 gundiyan Banayê, Evûqat Tahir Elçî, zilma ku li gundiyan Banayê bûye bi-re Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpa. Ev giliyê gundiyan ji aliyê vê komîsyonê ve ketiye rojevê. Ji aliyê vê komîsyonê ve, beyanek ji Evûqat Tahir Elçî re hate birêkirin û li gorê vê beyanê diyar dibe ku, komîsyonê ev bûyer kiriye rojeva xwe û li benda parêznameya dewleta Tirk in.

Li ser vê yekê, gundiyan Bana dan xuyan ku, dê bi tu awayî dev ji vê dozê bernedin û ta dawî bimesînin, da ku dewleta Tirk, di nava dewletên cihanê de rûşê bibê.

Evûqat Tahir Elçî, ji bo vê yekê ditînin xwe wiha anîn zîman: "Ev yekên ku anîne serê gundiyan tiştêkî pîrr erjeng e. Li gorê ditîna min sedemê ku hatine berdan jî ev serlêdana me ya Komîsyona Ewrûpa bû. Nîha em li benda parêznameya dewleta Tirk in. Emê jî li gorî wê, doza xwe bimesînin."

## Li Almanya YEKMAL-KURD ava bû

Li bajarê Hamburgê ya Almanya Yekîtiya Malbatên Kurd (YEKMAL-KURD) bi beşdariya rêxistin, malbat, sazî û sazandeyê Kurd ve, di 2'yê Gulanê de hate vakirin. YEKMAL-KURD bi beşdariya 200 malbatên welatparêz û Navenda Çanda Kurdistan-Hamburg, KOMKAR-Hamburg, HEVKAR-Hamburg, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK), Yekîtiya Dîndarên Kurdistanê (YDK), KAWA, YNK, PDK-Iran (nûnerên wan) ve hat damezirandin.

YEKMAL-KURD bi komcivîna xwe ya yekemîn re jî heyeta xwe ya rêveberiyê jî hilbijart. Di hilbijartinê ku Şerafettîn Kaya û nivîskar Cotkar jî tê de amade bûn. Ev kes jî bo

rêveberiyê natin hilbijartin:

Hüsnüye Ergun ji bo serokatiya yekîtiyê, Alî Acar ji bo cigirtiya yekîtiyê û Enver Budak jî, ji bo hejmarvaniyê hatin hilbijartin.

Ji aliyê din ve li Almanya li Eyaleta Bremen, li Saksoniya Jérîn li Hanover û li Eyaleta Hamburgê, biryara dersdayîna zîmanê Kurdî jî bo zarokên Kurd, ji meclîsa wan derket.

Li Eyaleta Bremenê jî meha Sibata 93'yan ve li 2 dibistanan, bi 2 mamosteyên Kurd ve dersên zîmanê Kurdî tê dayîn. Di sezona 93-94 a perwerdehî û hindekarî ya Almanya wê li Eyaletên Hanover û Hamburgê jî dersên zîmanê Kurdî jî bo zarokên Kurd dest pê bikin.



# Kurdistana başûr û azadî

**Li Kurdistana Başûr xebatên herî baş di warê çand û edebî de tîn meşandin. Nivîskar û hunermendên Başûr bi awayekî cidî û berpirsiyar çalakî û şixulên xwe didomînin. Ger hikûmeta Başûr bi hêzên Kurd re têkiliyên xwe zêde bike, yekîtiyê damezirîne û hêdî hêdî xwe ji bin mineta hêzên Amerîka derxîne, wê azadbûna parçeyê Kurdistana rizgarkirî saxlem bike.**

## Mazhar Günbat

Dema em ji Kurdistana Bakur derbasî ya Başûr bûn. heyeta me ji aliyê hin berpirsiyarên Hikûmeta Federe ve bi şeklekî resmî. Lê bi germî û kêfxweşî hate bixêrhatîkirin. Li hember vê rewşê Seyda Abdurrahman Durre xwe negirt giriya û tivinga pêşmergeyê maçî kir. xwediyê rojnameya Gündemê Kekê Yaşar Kaya ji hindik mabû bigiriya. Van hevalên me dan xuyakirin ku bi hesreta Kurdistaneke azad û serbixwe jiyane û bi gavavêtinan nav Kurdistana Başûr ev xewna xwe pêk anîne: wekî din ev bi hezar salan e ku gelê Kurd bi hesreta welatekî serbixwe jiyaye. Bi rastî jî, ku mirov şertên ekonomîk, siyasî û leşkerî yê Kurdistana Başûr deynê aliyekî û bêtî girêdanên wê yê bi şertên derve re binirxîne, ji mirov kirî Kurdistana Başûr welatekî bi temamî serbixwe ye.

Di nav hundirê van bajarên rizgarkirî de her cure xebatên dewletbûnê tîn meşandin. Memûrên dewletê dest bi karê xwe kirine. parlamentoya wê bi rêk û pêk civînan li dar dixê û qanûnan derdixê: polis û pêşmergeyên Kurd rîyan kontrol dikin û

rê li tevliheviyê digirin. Walî, qeymeqam û berpirsiyarên îdarî, gel li meqamên xwe qebûl dikin, wan guhdarî dikin û li gor îmkan û qaydeyên xwe dest bi çareserkirina problemên wan dikin. Herkesê xwedî şixul li ser karê xwe ye û jiyana xwe bi serbestî didomîne, şano, rojname û sazgehên çandî, faaliyetên xwe pêşkêşî gel dikin. Roja îne jî bi kêf, şahî û govendê gel westa hefteyekî jî ser xwe diavêje û ji wê rewşa azadiyê li gor îmkanên xwe îstifade dike û hwd.

Yanê ku neye bîra mirov ku çar aliyên Kurdistanê dijmin in û bi Hêza Çakûç a Amerîka, Sedam êrişên xwe sekinandine, hingê mirov bawer dike ku ji Zaxo bigirin ta Silêmaniyê, başûrê Kurdistanê welatekî serbixwe ye.

Lê ji nîşka ve tiştên ne xweş tîn bîra mirov. Ku sibehê Amerîka desteka xwe ya leşkerî bikîşîne û Sedam bi desteka Îran û Tirkîyê bi top, tanq û balefirên xwe êrişî ser Başûr bike wê çawa çêbe?

Ez van pirsên ne xweş ji mejiyê xwe diavêjim û ji xwe re dibêjim: "Helbet çareyek heye û amadekariyên hikûmeta Başûr jî helbet hene li hember ihtimaleke wisa."



Nivîskar û hunermendên Başûr bi giyanek şoreşgerî û rewşenbîrî dixebitîn. Ji bo ku problemên başûr û hemû Kurdistanê çareser bibin, di nav hewldanên girîng de ne.

Lê ev pirsên dijwar bi tu awayî jî serê min dernakevin. Ez xwe nagirim. Û ji rayedarên hikûmetê û nivîskarên Başûr dipirsim ku wê di rewşeke wisa de çî bikin. Bersiva gişan eynî ye: "Tiştêkî wisa nabe, Amerîka desteka xwe nakişîne; lê ku bikîşîne emê têbikoşin û li ber xwe bidin."

Bi rastî, ihtimal nadin ku Amerîka leşkerên xwe ji wir bikîşîne.

## RIHÊ YEKÎTIYÊ

Bi giştî, li Kurdistana Başûr di nav gel de rihê yekîtiyê bi cih dibê. Nema kes xwe wek terefdarê PDK'ê an jî YNK'ê diyar

dike. Mirov ji kî dipirse, behsa yekîtiyê dike û dibêje: "Em yekîtiyê û Kurdistanê diparêzin. Em azadiyê dixwazin." Min jî du sê zarokên biçûk pirsî, "Hûn Telabanî digirin an Berzanî" wan wîha bersiv da: "Ew jî bo me herdu jî yek in, em Kurdistanê dixwazin."

Li nêzikî Koysincar lawikekî sêzdeh-çardeh salî li jîpa me siwar bû. Wî jî qala yekîtiyê kir, lê dîsa jî xwe negirt û stranek li ser Berzanî got. "Bijî bijî Berzanî şîrîn Mesût Berzanî." Hengê şofêrê me jî xwe ne girt û bi lawik re strî. Me fêhm kir ku ew jî terefdarê PDK'ê ye.

Gelê Başûr dixwaze vî rihê yekîtiyê hîn xurttir bike. Ez jî gelek pirsê şerê navbera hêzên Başûr û PKK'ê dikim. Li hember vê pirsê min, pîr xemgîn dibin û keser dikşînin. Dibêjin, "Em pîr êşîyan bi wî şerî û pîr li zora me çû. Pîr ne xweş bû ku em û dewleta Tirk bûne yek û me bi PKK'ê re şer kir, lê em mecbûr man." Bes tev di vê dîtinê de ne ku careke din şerekî wisa di navbera Kurdan de çênabe.

## REWŞA ABORÎ

Gelê Başûr jî aliyê aborî ve di rewşeke pîr dijwar û ne xweş de ye. Ji ber bêtînkariyê Hikûmeta Federe jî nikare tiştêkî zêde bike. Karistan nîn in, yê hene jî naşixulin. Tenê çend hebek li Silêmanî û Hewlêr hene. Zevî gelek in lê nayên ajotin. Ji ber ku giş mînkirî (mayinkirî) ne. Dema Sedam hêzên xwe kişandine zêdeyî 20 milyon mîlîyî di erd û zeviyên Kurdistanê de, dane bicihkirin.

Heta zevî, jî mînan neyên pa-

qij kirin çandî çênabin. Wekî din jî ber tunebûna malzemên teknîkî, jî petrola Kurdistanê jî nayê îstifadekirin.

## 4500 GUNDÊN WÊRANKIRÎ

Ta em neçûn û me bi çavên xwe nedît me bawer nedikir. Ku 4500 gund jî aliyê hêzên Sedam ve hatine wêrankirin.

Bi sedan km. mirov diçe, leqayî yek gundekî nabe. Mirov dikare bibêje ku gund nemanê li Başûr. Ji Duhok ta Hewlêr, di rê de hejmara gundên ku me dîtin jî bîstan derbas nedibû. Gundên ku hatibûn hilweşandin, bi erdê re bûbû yek. Heta mirov neketa nav van gundan, ne di hate zanîn ku xerabgund in.

Hemû gundiyan Kurdistanê Başûr li bajarên bi cih bûbûn. Hikûmetê dest avêtiye ji nû ve avakirina van gundan, lê ji ber bêtînkariya madî û teknîkî ev xebat pîr hêdî dimeşin.

## XEBATÊN ÇANDÎ

Li Kurdistana Başûr, xebatên herî baş di warê çand û toreyî de tîn kirin. Nivîskar, hunermend û torevanê vî parçeyê Kurdistanê jî bo pêşvebirina civakê û zelalkirina mejiyê gel bi şev û roj dixebitîn. Bêtînkariya ku li raman û partiyên hev binêrin, di nav xwe de yekîtiyê û komele damezirandine û di dilê zehfên wan de hêviya Kurdistaneke yekbûyî û serbixwe heye. Lê dîsa jî zehfên wan bi binyata xwe jî YNK'ê bûn an jî aligirê YNK'ê bûn. Di warê çalakiyên çandî û rojnamevaniyê de YNK jî PDK'ê pîr pêkhatîr û jêhatîr xuya dikir. Ev jî avantejeke girîng e ji bo YNK'ê.



Bi sedhezaran gundiyan Kurdistanê Başûr ku gundên wan hatine hilweşandin, li bajarên wek Hewlêr, Silêmanî û Duhok bi cih bûne. Bes ji bo her malbatekê odeyêke biçûk an dikeve an nakeve.



# PÊNÛS



Amed Tigris

## Enî, dem û dezgehên neteweyî

**E**nî (bere- cephe) li dijî dijmin, kombûna hemû hêz û îmkânên neteweyî ye. Ew encama hemû dem û dezgehên (muesesên) neteweyî ye. Yanî enî li dijî dijmin komkirin, kanalîzekirin û bi organîzekirina hemû partî, hêz, kom û kesên niştimanperwer e. Herwiha bingeha eniyê li ser dem û dezgehên neteweyî tê avakirin. Li ser wan xurt û berfireh dibe. Pêş dikeve.

Gelo ev dem û dezgehên neteweyî çi ne? Bar û berpirsiyarî, tixûb û çarçoveyên wan çi ne?

Pêwist e ku, pêşî partî û rêxistinên siyasî yên Kurdistanê li ser program, prensîb û metodên xebatê û awayê îdarekirinê li hevdu bikin. Rêxistina herî fireh, demokratîk û neteweyî eniya Kurdistanê ava bikin. Enî demokratîk û neteweyî be. Berfireh be. Her rêxistin û kesê Kurd ên niştimanperwer bigire bin sîwana xwe. Dem û dezgehên ava bike û bi awayekî aktîv û demokratîk bixe nav xebatê. Yanî bingeha îdareya xwe ya neteweyî û demokratîk par-

lamente-rên Kurdistanê hilbijêrin. Parlamento, organa herî mezin û bilind be. Ew di warê neteweyî û navneteweyî de nûnertiya Kurdan bike. Li her welatî bi awayekî fermî buroyên xwe veke û wek konsolosxaneyên Kurd bixebite. Gerîla bibe artêşa neteweyî, artêşa hemû Kurdan.

Di warê çapemenî û weşanî de jî divê dem û dezgehên neteweyî, demokratîk û kolektîv bîr dameziran-din. Alfabe, gramer û rêzimanêke hev-girtî hebe. Rojnameyên rojane bi zimanên cur be cur derkevin. Yên ku hene bibin mal û zimanê hemû Kurdan. Stasyonên radyo û televizyonên neteweyî bîr avakirin. Enstîtu û akademyên ku hene an jî yên ku bîr dameziran-din, deriyên xwe ji her Kurdekî/ê niştimanperwer re veke. Ew ji bin tesîra rêxistin, kom û şexsan derkevin û bibine malên xelkê. Bikevine xizmeta Kurdan. Divê hemû Kurd li ser al û marşa Kurdan a neteweyî bi hevdu bikin. Al û marş yek bin. Herkes bi marşa neteweyî di bin ala Kurdî de bimeşe.

Lê hezar mixabin, dema mirov li pratîka jiyana yekbûn û eniyên me Kurdan dinêre ev prensîb, daxwaz û hêviyên ku min li jor behsa wan kir; mirov ew nabîne. Jiyan a yekbûnê wiha gelekî kurt bûne. Heta neketine pratîkê. Sedem gelek in. Niha jî wiha ye. Li başûrê welatê me, ji demeke dûr û dirêj ve bere heye. Heta Dewleta Federê dameziran-din. Lê, di pratîkê de wek bere naxebitin. Bere formel e. Heta Dewleta Federê formel e. Artêşa Kurdistanê nehatiye dameziran-din. Bankayeke federalî tune. Radyo û TV, ên bere an jî yên Dewleta Federê tune ne. Rojname herwiha. Her partî rojnâmeya xwe derdixe û kanala TV' ya xwe çêkirîye. Wezîr hene, serokwezîr heye, lê hîn jî serokên partiyên li ser navê wan kar û barên siyasî didomînin. Aleke wan tune. Divê partî û rêxistin jî hebin. Lê fonksiyona partî û eniyê cuda ne.

Dema dem û dezgehên neteweyî yên giştî tune bin, dewlet çênabe. Çêbibe jî, nabe dewlet û zû hildiveşe. Ji bo wê yekê jî, divê eniyêke me hemû Kurdan hebe. Artêş hebe. Parlamento hebe. Weşan û çapemenî hebin. Li gor mercan partiyên legal û îllegal hebin. Rêxistinên demokratîk û girsî hebin. Al û marşeke me ya neteweyî hebe. Bi kurtahî divê em Kurd ji vir û şûn ve, wek netewe bifikirin û wek dewlet xwe bi organize bikin. Rewş û prosesa ku em Kurd tê de ne ev e.

**Divê û pêwist e ku, em Kurd ji bo berjewendiyên neteweyî bifikirin û xebatê bikin. Ên ku hene biparêzin. Xwe ji damezirandina dewletê re amade bikin. Dewlet bi tenê ne serbixwebûn e. Federe jî yek ji formê dewletê ye. Heta otonomî jî, xwe bi xwe îdarekirin e. Ew jî ber bi dewletê ve diçe. Pêwist e em dem û dezgehên ava bikin. Ev jî bi pêkanîna eniyê ve dest pê dike. Dewlet li ser dem û dezgehên ava dibin.**

## Çend nêrîn li ser pirtûka Mehmed Uzun

# Destpêka Edebiyata Kurdî

### Fener Rojbiyanî

Îro tevgera toreyî ya Kurdî pîrr gavên pêwîst pêşve avêtiye, sedema van gavên dîrokî, ne ji valabûnê tê. Lê ew zexm û hêza xwe ji toreyî Kurdî ya kevnare û berê wî jî, ji zargotina me distine. Ev zargotina herî fireh, rengîn û dewlemend bûne çavkanî û jêder. Îro, em nîfşên nû baş toreyî xwe û çanda xwe dinasin. Ev jî bi saya camêrên Kurd ên ku ji me re penceran vekirine da ku em di wê re li pêmahiya çandî binêrin û jê sîd bistînin. Îro gelek helbestvan û zanyarên me hene, divê ew berhemên ku di nav tariyê de mane, derxin ronahiyê. Ji bo çareserkirina vê pîrsê hemû berpirsiyar in. Divê torevan û dîroknivîsên Kurd vî karî û emanetî bidin ser milên xwe û dîroka peyde û pêşveçûna toreyî gelê Kurd binivîsin. Ta ku xort û keçên me bi awayekî baş û çak dîroka xwe bixwînin û pê biweşin (xwedî hest bin) û bizanibin di dîrokê de ji gelê Kurd kê/kî, li kîjan deverê, kengê û çi kiriyê an jî çi nivisiye, çi gotiyê; der mafê doza azadî û serxwebûna Kurdistanê de.

Di vî warî de gelek nivîskar û dîroknivîs xebitine û berhemên giranbuha amade kirine. Bi saya van camêran ên ku li jêr min rêz kirine, toreyî Kurdî bi dest van jî windabûnê rizgar bûye:

- **Aladîn Secadî; Méjûyî Edebê Kurdî**
- **Qanatê Kurdo; Tarîxa Edebiyata Kurdî**
- **Refîq Hilmi; Edebê Kurdî**
- **Kerîm Şarezayî; Koyî û Şarekanî**
- **Sadîk Bahadîn Amedî; Hozanê Kurd.**

Di vê dema dawî de pirtûka Mehmed Uzun der çû. Mijara wê jî li ser nivîsandina dîroka toreyî Kurdî ye û ji Weşanê Beybûnê der hatiye.

Piştî xwendineke kûr û dirêj û bi çavakî rexnegirî li gorî nêrîna min: hin qelsî tê de hene. Dîsan gelek kemanî di warê zanişwarî (malumat) û agahdariyê de heye. Têbînên (nêrînen) xwe ez bi van xalên jêrîn tinim ziman û dinivîsim:

1. Li ser berga pêşîn "Destpêka Edebiyata Kurdî" hatiye nivîsîn: Mirov ji vî navî fêhm dîke an jî serwest dibe ku, bi lêkolîna edebî ketiyê hundire gewrebana edebî. Gava mirov dibêje "destpêk" bi lez û zûka mirov fêhm dîke ku tiştêk dest pê bûye. Em werin ser pirtûka xwe û destpêka wê. Gava nivîskar an jî dîroknivîs tê li ser babetekê disekîne, divê ji kevintirîn dest bi berhem û nivîsarên Kurdî bike. Û li gorî rêzîkirina wê dîrokê binivîse. Ferq nîn e, li kîjan deverê nivîsandiyê. Yanî destpêka toreyî me ne bi tenê bi **Cizîrî, Herîrî, Xanî, Feqiyê Teyran** in. Ka cihê van kesên li jêr di pirtûka me de li ku ne?

a) Helbestvan, zanyar û sofiyê mezin **Baba Tahîrê Hemedanî**, (995-1010) û dîwana wî ya ku li Tehranê di sala 333 koçî di hatiye çapkirin. Di dîroka toreyî Kurdî de ev helbestvan cihekî pîrr girîng û bi nîrx girtiye; ji helbestvanê herî pêşî tê jimartin û serkêşiya torevanên Kurd dikîşîne.

b) Zanyar û helbestvanên mîna **Mele Mehmûdê Beyazîdî** û nivîsara wî **"Jîn û Ayîna Kurdan"** **Îsmailê Beyazîdî** û helbestên û ferhenga wî ya bi navê **"Gulîzar"** **Şerefxan û Pertew Begê Hekarî** û dîwanên wan. Dîsan Muradxan û helbest û pirtûkên wî ya bi navê **"Zembîl-firoş."** **Xarîsê Bitlisê; Leyl û Mecnûna** wî: Di pirtûka me de, der barê van agahdariyan de, li ser nehatiye rawestandî û bi firehî nehatiye şrovekirin.

c) Dîsan yekemîn rêzîmanîvîs û pexşanîvîsê Kurd **Eli Termaxî** di pirtûka me de nehatiye çêkirin (behskirin). Eli Termaxî, mirovekî gelek zana û zanyar bû. Ew bi zimanên Farsî, Erebi û Tirkî baş dizanibû û xwedî van nivîsarên giranbuhane: **Qewlê Yekkan, Kurê Vatan, Morîya Yaqût, Jiyana Heqîqetê Xewne** û pirtûka wî ya bi navê **Uzun** deng, herî mezin: **Destûrî Zîmanê Erebi**—(bi Kurdî). Ew jî pirtûkek rêzîmanî ye.

2. Di beşa edebiyata Kurdî, têkoşîna man û nemanê de, di rûpela 11'an de, der mafê du malikên Meleyê Cizîrî de nivîskarê me di pirtûka xwe de wilo dibêje: "Bi qasî ku ez fêhm dikim yek ji van şebaban ku wê demê zîmanê herî pêşketî û edebî yê Farsî bû, hemû Rojhilata Navîn kêm, zêde Farsî bi kar dianîn û bala Kurdan li ser Farsî bû. Meleyê Cizîrî bi van rêzan xwestiyê bala Kurdan bikişîne ser zîmanê wan." Ez dibêjim:

a) Zîmanê herî mezin di wê demê de zîmanê Erebi bû, ji ber ku ew zîmanê Quranê bû. Hikarî û bandora wê jî li ser zîmanê Kurdî, Tirkî û Farsî baş tê xuyan. Bi çav xuşanekî, li ser pêmahiya çanda Kurdî nemaze ya kevin. Emê bibînin ku çawa peyvên Erebi ketine nav zîmanê me û ta kîjan tayê (tebeqeyê) hikariya zîmanê Erebi li ser zîmanê me heye.

b) Gava Meleyê Cizîrî bang û hawarê xwe dike ku bala Kurdan bikişîne ser zîmanê Farsî, gelo çima Meleyê Cizîrî helbestên xwe bi Farsî nenivîsandine? Çima ev daxwaza xwe li ser şagirtên xwe mîna Feqiyê Teyran pêk neaniye? Mirovek bixwaze bala mirovekî din bikişîne ser babetekê, divê beriya herkesî ew bixwe pêk bîne;

3. Di beşa li ser babeta pêşketina toreyî Kurdî û girêdana wê, de bi domandina hebûna mîrekeyên mîna Botan, Behdîna, Soran, Baban, Ardelan û Mûkûrî tunebûna wê jî tê girêdan bi hilwe-

şîna van mîrekeyan. Ez dibêjim ta ku zîman û toreyî bikaribe bijî û bi pêş keve gelek merc û derfet jê re pêdiviyê. Bi belavkirina hewayeke demokratîk û azad, serbestbûna peyvîne û bi avakirina dam û dezgehên çandî. Piştî ew dema nivîskarê me dibêje, dema bi xêr û bereket a edebî û çandî car din hate dubarkirin, li rojhilat û başûrê Kurdistanê.

4. Di beşa Zîmanê Kurdî û zehmetiyên li ber de. Îro bi nêrîna min, ez dibêjim ola îslamî ji nîjada Kurd re biyan û dîr tê jimartin. Çimkî dijberiyek di nav naveroka ola îslamî û taybetiya nîjada Kurd de heye. Ji hêla zîmanî, civakî û bi psîkoloji jî. Ne ji dîr û nêzik, tu pêwendiyên ola îslamî bi gelê Kurd re nîn e. Wek nivîskarê me jî dibêje, nebaşiya wê jî li ser pêşketina Kurdî bûye. Ta rojên îro em encamên nebaşiya ola îslamî û hikariya Quranê li sir zîman dikîşînin. Lê mixabin, nivîskarê me bi rengek fireh li ser ola **Yêzdiyên-Zerdeştî** û pirtûkên wê, rola wan di parastina zîman de, ew ola ku ji nava Kurdan rêber û pêxember derxistiyê û şewqa wê olê ji Kurdistanê hatiye der, ranewestiyayê. Pirtûkên mîna **Avîsta, Cilwe, Mishefa Reş û Stranên pîroz**. Ev hemû pirtûk bi Kurdî hatine nivîsandin û ta rojên îro rola xwe dileyîzin. Rastiyeke didin ku zîmanê Kurdî zîmanekî kevn û serbixwe ye. Taybetiyeke wî jî he ye, ev pirtûkên hanê bûne cihe lêkolîn, jêderk, lêveger ji zîmanzanên Kurd û biyanî re. Nivîskarê me bi carekî çêra (behsa) pirtûka dîrokî ya **Zerdeşt Zend-Avesta Pîr Şalyar "Stranên Pîroz"** nekiriye. Ev pirtûk ji hêla hunerî ve jî hemû pirtûkên pîroz ên hersê olên mezin ve pirtûka herî baş, şîrîn tê jimartin.

5. Ji bo dîrokê ez dibêjim, destpêka amadekirina alfabeya Latîni di sala 1919'an de ye. Yanî berî ku Atatürk bê û desthilatê bi dest bixîne, Gava me alfabeya Latîni ji xwe re bijart, ne bi sedema hikarî û qebûlkirina Tirkan bû.

6. Nivîskarê me jî dibêje: "Îro %98 Kurdên Suriyê nikarin bi alfabeya Latîni bixwînin." Were em tev li dîrokê binêrin, zewarê (cihê ku lê peyde bûye) alfabeya Latîni ya Kurdî, li kîjan beşa Kurdistanê ye? Emê bibînin ku ev alfabe ji Kurdistanê Suriyê der hatiye û bi riya kovarên mîna **"Hewar"** û **"Ronahî"** hate belavkirin û gihiyaye beşên din. Îro kovarên ku li Kurdistanê Suriyê der diçin mîna: **"Stêr", "Gelawêj", "Gulistan", "Aso", "Zanîn" û "Pîrs"**, xwerû bi tipên Latîni tene nivîsandin. Hemû nivîsar, berhemên torevan û nivîskaran bi vî tipê tene nivîsandin û xwendin. Ma dîwanên bavê helbesta Kurdî ya nûjen **Ma-moste Cegerxwîn û Seydayê Tirêj** û hwd. bi çî tipê tene nivîsandin?



## Folklorê ma di 'qilûlikî'

### Boxlonij

Jmarî Welatî 58 di J. Espar bi nomê "Foklorê ma di vateyê kay" nuştîşêk nuştî. Gwerê mi, ina nuştîş nuştîşêka bi rûmet a. Çimku in beşêkê kulturî ma wû heta êrî nyamo nuştîş. La belê ez wazena in warî di çend çiyon vajî.

Espar vano:.. Vateyê kay kultur, psikolojî û zewqê gedan îfade kenî. Nê babetê folklorî di yew fikir ya zî mantiq çinî yo... Ez îfadekerdişî Espar he ta radêk ca di vînenâ ku in psikolojî û zewqî gedan îfedi kenî. La belê ez nişkênâ vajî ku in babetê folklorî di çik îfadinîkenî. Vêrî herçî di ita di yo huner estû. "Vatê kay" zê şîr amê vatîş û tyerkerdiş. Gwerê baweriyê min "Vatê kay" zonî Kurdî di qeydêkê tewkerdişî şîr o zaf kon û. Gelêk kilm amê vatîş û bi yo ahengêk zî yenî qêdyayîş. Zafî yin zî badî di ryêzan bi yo hev deng yenî xelaskerdiş.

Herçend "vatê kay" direkt zê şîr û kilamon nyêrî vatîş zî. warî hunerî di tesîrê ko gird viraştî. In yo qeydê fantazî û. Û musik, helbest û hunerî şiklî.

Bye inonî zî ita di merdum gelêk îronî vînenû. Ironîwû verî merdumon, heywonan, çiyon (tiştan) û hçb. In îronî zî girêdayê rewş û avahî civatî yê.

Heger in berhemon ser lêkolîn û gêrayîşêko werdi û derg byerû viraştîş, uwext mer-

dum hindênê zaf eşkenû in warî di fikrî xwi vajû. La belê qeydêko ez bawer kena in vatê zaf kon î. Adawara zî zaf cefawû ku merdum vajo in yo mantiqêk îfadi nêkenî.

Badê in vatona ez wazena helindê "vateyê kay" di vatê "qilûlik" on binusî. Çimkî, herçend in vatê qê kaykerdiş yenî vatîş zî ez mane yin hiratîr vînenâ. Vatê "qilûlik" o. A zî hîre wû. Zaf celebun genû xwi zeri. Qîsuyet qilûlikon awo kilm î te di huner bi îronî zaf û zê şîr zî eşkenî byêr vatîş. Merdum eşkenû vajû "qilûlik kaykerdis" zî. La belê vatê "qilûlikî" hin kilm û him zî weş û. Ez nika ay vatona re çend nimunan dona.

Salaxa satilaxa  
Qonaxa qontiraxa  
Helefî melefî  
Pirtelefî  
Artutik berwatutik  
Şexgelonî devrutik

Hoo  
Pefî pefî sepetî  
Terezî merezî  
Com lastîk

Yeko dîko  
Sîko hesîko

Gulê gulê  
Ling berxulê  
Apo Qaso  
Ling papaso  
Qilê qilê papasî  
Çurdîm çurdîm kirdesî.

## Kovara Çanda Gel

Kovara Çanda Gel a ku li başûrê rojavayê Kurdistanê (Sûrî) dertê, hejmara xwe ya pêncemîn ji pêşkêşî xwendevanên xwe kir. Kovar ji sê mehan carek dertê û bi Kurmancî û Erebi ye.


Çanda Gel bi giranî li ser çand, huner, siyaseta û dîrokê radiweste. Lê bi giranî bi Erebi dertê. Kovar 64 rûpel e, di teşeya pirtûkên normalde, bi kaxezê spî yê bi qalîte diweşe. Ji 64 rûpelan 53 rûpel bi Erebi, yê din ji bi Kurmancî û bi tîpê Latîni ye.

Di beşa Kurmancî de: Ferhengok, Rêzîman û Gotînek, Kurteçîrok, Çand Jiyan e, Rola Dayîkê û nivîsek li ser Musa Anter bi navê Apê Mûsa heye. Di beşa


bi zimanê Erebi de ji çend nivîsaran jê ev in: Li ser navê Heyeta Nivîsê nivîsa bi navê "Serhildana Newrozê, Serê Başûr û Meclîsa Neteweyî", nivîsa Mazin Avdila "Peydebûna Ramanekê", helbesteka helbestvanê Yewnanî Adonis Bodoris, A.Dicle "Jin û Xebata Rizgariya Kurdistanê" nivîsa mebûsekî Kurd ji parlamentoya Sûrî bi navê "Nêrîneke Serbest", bi serokek Partiya Zehmetkêşên Kurdistan re hevpeyvînek û di besa Nîstîmanê xwe Binase de bajarê Sêrtê tê nasandin. Nivîs ji pirtûka Cemsîd Bender a bi navê ku em wergerînin Kurmancî "Dîrok û Saristaniya Kurdî" hatiye standin.

Kovara Çanda Gel hejmara xwe ya pêncemîn di meha Sibata 1993'yan de derxistiye.

Çanda Gel



Berga Kovara Çanda Gel



Di wêneyê jor de beriya guherîna navê Kaniya Ehmedê Xanî tê ditin.

## Tîpa 'X' û Kaniya Ehmedê Xanî

Li Agirî, navê Kaniya Ehmedê Xanî bi biryara mehkemê guherî û Xanî bû Hanî.


Belediya bajarê Agirî, par bi biryara Meclîsa Belediyê bi navê Ehmedê Xanî û Urfan Alpaslan 2 kanî dabûne çêkirin. Lê ji ber tîpa 'X' ku di navê Xanî de ye, waliyê Agirî ji belediyê daxwaz kiribû ku ev nav bê guherandin. Lê, belediyê vê daxwaziyê red kiribû. Li ser vê yekê, walî ji bo ev nav biguhere mehkeme vekiribû.

Mehkemeya ku par ji aliyê walî ve, li ser tîpa 'X' ya di navê Xanî de hatibû vekirin, çend roj berê biryar girt ku ev nav biguhere. Li ser vê biryarê, bîyî ku agahî bidin belediyê, tîpa 'X' guherandin û li şûna wê 'h' danîn. Bi vî awayî jî, Xanî bû Hanî.

Serokê Belediye Agirî Fevzî Bulut, vê kirinê protesto kir û wiha got: "Me bi biryara Meclîsa Belediyê çend kanî darte

çêkirin û navê kesên ku ji Agirî derketine li wan danî. Navê kaniyeke me Urfan Alpaslan e ku di sala 1987'an de, li Uludere di şer de şehîd ket, ê din jî Ehmedê Xanî ye ku nixke çand û edebiyata me ye. Ev biryara mehkemê, li hember îradeya gel e û îradeya gel bi tu tiştêkî nehesibandî ye."

Li ser vê navguhertîne, Kurdên li herêmê jî dengên xwe bilind û vê kirinê protesto kirin.



Di wêneyê de, piştî guherîna navê kaniyê dide nişan ku Xanî bûye Hanî.



# Kiştîşê Armeniyan



Belgeyêke dîrokî, Sal 1932

## J. Espar

Ewro hinî yew sir niyo ki dewletêy Osmaniyan bi sehinzaran reyra Armenî kiştî. Ebe gore bê Garo Sasunî, jenosîdê menga (aşma) Nîsanî 1915 di yew milyon ra vêşî Armenî bi destê Tirkan kişiyayî.

Şadey nê jenosîdî hema weş î. Mi nê şadan ra yewîrayrâ na mesela ser o qise kerd. Na şada yew cenika Pî-

ranij a. Namey yay Emîna wo û nika neway (90) serra ya û Diyarbekir di roşena. Zeki qisekerdişê yay ra zî fahm beno, ya bi xwi ay wexto hema geda ya. Çiyê ki na mesela ser o Emîna virî di mendî bi ma girewt yew qaset û vatey yay nê qaset ra nuştî. Tira pey na mesela ser o mi çen ray Emîna reyra qisey kerdî. Ez bawer keno ki bin nê vatişanê Emîna, ma derheqê jenosîdê Armeniyan

di toyî çiyane newan musenî (bander benî). Emîna bi inhe wa dest bi xeberanê xwi kena.

"Seferbîlig (1) bi, hukmatî qatirê kê, kê ra girewtinî. Esker remaynî omeynî. Taştere wo, ez eyel o û ber var di ronîştewo. Mi di dawil kuway. Mi va: "Ina çi dawil a?" Va: Dawiley seferbîlig a." Mi di, roj bi tarî, ez nêzana çî yo. Oxmona ki roj gêriyawo. Ez barmeno û ez vano: "May mi nêomeya, pî mi nêome wo." Qatirey ma zî hukmatî kaş karda, barda. De de mi di, hewna bi roşn. A rojo ki roj gêra, tira pey seferbîligê Armeniyan rona.

Pîran di Armenî seferbîligê Hesenqele ki bi kişî. Hukmat geyra Armenî rêday, keyan a rêdaynî pey resne têra bestinî û bardinî yabon a kişî. Mi virî yeno, ona to di hezey eskerî sewq nêkenî, eynî ay hewa sewq kardinî û polê yinî bestinî û bardinî dewî ra ki vetinî, panaynî kişî. Perey-merey yinî bî, tira vetinî û ca vardaynî omeynî. Cilê yinî tira vetinî, hêgay yinî xwi ser o tapu kardinî. Bonê yinî hukmatî girewtinî. **Ay Zefî Be-cikî** (2) bî, ayino Armenî pey resne têra bestinî-kelem-

çey çinê bi bardinî **Teyerey Sînorî** (3) di, **Zixrê Resulan** (4) di û **Koy Bawkon** (Bawkan) (5) di kişî. **Key Sagî** ra pî **Husynê Sagî**, **Key Lokoy**, **Key Êloy**, **Key Asoy Mirzoy** kişî. Armenî pêrû kişî. Dat Hesenî (6) vatinî:

**Emerô Qiro'y** (7) va: "Ganî ez gonî veco." Yew way me bî, ma day bide, gertwî day yew kerra ro parçe parçe kardi.

Ay hewa, ay hewa Armenî qêdenay. Çik memleket di bi, tek-tuk Armenî mendî. Ay tek-tukê ki miendi zî senetkar bi.

Yew yew senetkar ki bibinî, yewdo sey **Xal Zilfoy Miçoy**, (8) yewdo sey **Awoy Gureyon** (9) û Key Hacı Axay yê nimitinî, **Hacı Axay**, (10) **Key Sagî** nimitî. **Key Xal Zilfoy** xwi ra **Key Kasparon** nimitî.

(1) Seferbîrligo ki Emîna behs kena, Harbê Yewin e. Dîna ra pey dewletêy Osmaniyan îlan kerd bi.

(2) Zefîyo Bejik: Yew tewir eskerê milîs î. (Bewnê, Malmîsanij, Ferhengê Dimilki-Tirkî)

Na mesela ser o, Garo Sasunî zî behsê toyî "cendir-

manê muwaqatan" keno. Sasunî vano: "Semedo ki îdarey Osmaniyan eşîran (Kurdan) ra şuphe kerdinî, Kurdê ri'yey (Kurdê ki eşîr niyî) vetî meydan. Yê kerdî cendirmey muweqetî û bi çek eşîran kerdî û destur da yinî ki, yê Armeniyan qir bikî û bi dest sernayîşê maldê Armeniyan reyra pêti bibî." "Bewnê, Garo Sasunî, Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni Kürt ilişkileri, 15 yy'dan günümüze. Ripper, 153)

Helbet ma nêzanî cendirmeyê muwaqetê ki Garo Sasunî behs keno, Zefîyê Becikê yan nê. La belê her hal û kar di, Zefîyê Bejikî yew çuwetê dewletêy Osmanî yo.

(3) Teyerey Sînorî: Beyntarê Pîranî û Xaçekê Şêxendelon di yew ca wo. Hewawo ki Emîna vana, na dara teyeri, sînorê Pîranî û Xaçekê Şêxendelon beylu kerdinî. Ayay ser o namey na dari biyo Teyerey Sînorî. Pîran di, bi name bê Xaçekê Tilistonî (Qasimon) û Xaçekê Şêxendelon di dewî estî. Xaçekê Şêxendelon resmîyeti di, Xaçekê Tilistonî ra beste wo. Dewletêy Tirkan, namey Xaçekî kerd, Taşagîl.

(4) Zixrê Resulon: Beyntarê Xaçekê Şêxendelon û Xiraba (Qaçigo Corên) di yew ca wo. Xiraba zî resmîyetê di babestey Qocigê Cêrin a. Dewletêy Tirkan nemey Qocigê kerd, Kurudere.

(5) Koy Bawkon (Bawkan) î: Nizdî Bawkanî yew ko wo. Bawkan yew dewa Pîranî ya, dewletêy Tirkan namey na dewi kerd, Pekmezçiler.

(6) Dat Hesenî ki Emîna behsê yê keno, Armenî Pîranî yo û key Kasparan ra wo. Dat Hesen hetanî nê serranî peyanan weş bi û Pîran di çulagey (çulçey) kerdinî. Dat Hesen, pî Şewket û Şukrî Esendîr o. Gedey Dat Hesenî Istanbul di roşenî.

(7) Emero Qira: Zefîyo bejik biyo. Hewawo ki Emîna vana. Emero Qira Pîran ra Mehlay Cellon ra biyo. Namey na mehla Tirkan kerd, Yeşiltepe.

(8) Xal Zilfoy Miçoy: Pîran ra Key Melemeron ra bi. Pî Sâdik Atli, Dervîş Atli, Hacı Atli yo.

(9) Awoy Gureyon: Pîran re Key Gureyno re bi. Pî Mehmet Aydemîri yo.

(10) Xacî Axa: Pîran ra Babdey Axan re bi. Pî Hesen, Bekir, Elî Xacî Axa yinî bi.



## Heval Dr. Ronî (Nazmî Uçar)

Em dê te bi coşa me ya ku bi şoreşê re mezin dibe re, di têkoşîna xwe de bijînin.

*Li ser navê malbata wî*  
**Dicle Uçar - Kemal Uçar**

Em agir in

Em agir in

Em kîn in

Em karker in, em gundî ne

Em gişî yek in

Em,

Bi kesên ku dibêjin tohildan re, sed hezar in

Em dengê gelê Kurd ê ku serî hildide ne.

**Dr. Ronî**



# Evdirehîm Rehmiyê Hekarî



Wênayê ciwaniya Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî

## Zinar Bawer

Ew nivîskar û helbestvanê welatparêz li Elbakê (îro bi navê Başqale qeza Wanê) di sala 1890'î de ji dayîka xwe bûye. Navê wî Evdîrehîm Rehmi ye. Di karûbarê dewleta Tirkîyê de, bi navê Abdurrahîm Zapsu tê naskirin û pirtûkên xwe jî bi wî navê daye çapê. Ew ji mala Hekarîyan e. Weke tê zanîn, jî wê malê gelek ronakbîrên heja derketine.

Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî, xwendina xwe ya destpêkê li Elbakê, ya navînî li bajarê Wanê di dibistana mamostetiyê de temam kiriye. Bavê wî Seyîd Mehmed Pertew ji mala Seyîd Ewdilqadir Geylanî ye. Heya îro bi qencî û neqencîyan tesîra wê malê li navçeyê heye.

Wekî begên zordest, begên ji bo welatê xwe şehîd bûyî jî di wan malan de bi hev re jiyane. Îro jî wê bûyerê em baş dibînin. Ev navçeya ku helbestvan lê mezin bûye, lê mirovên herî niştimanperwer hatine û çûne. Çandîya gelê Kurd li wê navçeyê baş hatiye parastin û di bin tesîra Erebb, Tirk û Eceman da nemaye. Ji bo wê jî, hozanê nemir ev navçe diyarî gelê Kurd kiriye.

Helbestvanê heja di xortaniya xwe de perwerdeyeke olî (dîni) jî wergirtiye. Paşê çûye bajarê Stenbolê, di Zanîngeha İlahiyatê de, xwendiyê û zanîgehê temam kiriye.

Em cara pêşî helbestên wî di kovarê "Jin" de dibînin. Kovara "Jin" di dîroka wêjeya Kurdî de kovareke pîrr girîng e. Ji bo kar û barê welatperwerî, di hincihan de îro bi kovara "Jin" em ronahî dibin. Nivîskar û karên rêzanî, jî bo welatekî aza û pêkhatî, em di wê kovarê de di-

bînin. Ên di kovarê de dinivîsin ji wana yek jî. Evdîrehîm Rehmi ye. Ev kovar di sala 1918'an de li Stenbolê dest bi çapkirinê kiriye û bîst û pênc hejmar hatine weşandin.

Wî ne tenê helbest, di pîrr aliyên de gotar nivîsandine û berhemên li ser ola îslamî jî dane çapê. Gotinên pêşyan kom kiriye, dîlok, destan, şano (tiyatroy), serpehatî û stranên di nav gel de bi gotinên hozanên Kurd civandiye. Mirov dibîne ku dema karê dewletê dikir karên çandî jî kiriye.

Her çiqas dema mirov li ser berhemên wî raweste, bi aliyê olî ve giran be jî, lê belê aliyê wî yê Kurdewatî (Kurdîti) girantir û girîngtir e, jî aliyê wî yê îslamî. Mirov wê bîr û baweriyê, di gotarên wî yên di kovara "Jin" de cih girtin e de dibîne. Wî jî wekî hevalên xwe di kovara Jin de cih girtiye û jiyana xwe jî bo welatê xwe domandiye. Li ser rewşa gelê Kurd û azadbûna gelê Kurd, rojên xwe borandiye. Riya azadbûnê di yekîtiyê û hevkarîyê de, ew dibîne. Di nava neteweyekî (millet) de, yekîtiyê nebe, azadbûna wî gelî jî, ewqas wê dijwar bibe. Ew bîr û baweriyê îro jî bo gelê Kurd ku rojane ye di helbesteke xwe de wilo nîşan dide:

"Ey milletê sahibinîfaq  
Lazim ji bo te ittîfaq  
Yek bin, nemînit bê eser  
Dest dene yek şîbê bira,  
Hil kin ji bo xwe yek çira,  
Aqilê xwe berhev kin hemû."

Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî, di kurteçîrokeke xwe ya bi zimanê Tirkî, bi navê "Mijûliya Beyaniya Dîlberek Kurd" \* de cih daye dîlokek bi zimanê Kurdî.

"Zozan e xweş zozan e,  
meşka min  
Meşka mast, miyan e, kil meşkê  
Law ji malêd miran e,

meşka min  
Eşqa Mem û Zînan e, kil meşkê  
Îro li me mêhvan e, meşka min.

Evîn e xweş evîn e, kil meşkê  
Lawê min hêj kurîn e.

meşka min  
Qevda şûrî zêrîn e, kil meşkê  
Ji dîr me yek du dîn e.

meşka min  
Day baban hay jê nîn e,  
kil meşkê."

Berhêmên wî yên li ser îslamiyê derketine yên girîng ev in:  
Dîn-û Kîn, Çapxaneyê Aydinlik, 1947

Diramim û Dipirsim, Çapxaneyê Aydinlik, Stenbol 1942

Ömar Hayyam, Çapxaneyê Stenbol, 1942

Dîroka Enbiya, Çapxaneyê Siralar, Stenbol, 1956

Dîroka îslamiyê ya Mezin, Çapxaneyê Siralar, Stenbol, 1957. Zimanê nivîsandina van kitêban bi zimanê Tirkî ye. Bi zimanê Kurdî bi zaravayê Kurmancî bi navê:

Gaziya Welat (Berhevok Helbestên Kurdî)

Memê Alan (Şano-Piyes) hatine çapkirinê.

Li ser kar û barê Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî pirtûkek jî aliyê Weşanxaneyê Xanî û Bateyî li Danîmarkê di sala 1991'an de, çap bûye û dîr û dirêj li ser wî tê rawestandî. Çend helbestên wî li jêrîn û bêhtir welatparêziya wî baş nîşan didin.

Ew di roja 9'ê Sibata sala 1958'an de, çûye ser heqiya xwe.

## Destê Tenê Deng jê Nayêt

Ey milletê sahibinîfaq  
Lazim ji bo te ittîfaq  
Te sis nekin em yek wifaq  
Mehwiyyet el bil-ittîfaq

Aqilê xwe berhev kin hemû

Wext zeman pîrr nazîk e  
Bêyî nîfaqî tehlûke  
Xelqan hemû di gel me rik e  
Mehwiyyeta me bê şîk e

Aqilê xwe berhev kin hemû

Şexsiyetê bavêne der  
Yek şexsî şol nayête ser  
Yek bin, nemînit bê eser  
Şola umîda me li ser

Aqilê xwe berhev kin hemû

Dest dene yek şîbê bira  
Hil kin ji bo xwe yek çira  
Riya ku tarî ye j me ra  
Ronahî lazim vê sîra

Aqilê xwe berhev kin hemû.

\* Jin hejmar 4

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Em çûn Laleşê

Li ser vexwendina Hikûmeta Federe ya Kurdistanê Başûr, çend rojnamevan û rewşenbîrên Kurd, di 17.4.1993'an de, çûne Kurdistanê Başûr. Di nav wê komê de, min jî li ser navê Enstîtuya Kurdî cih girtibû. Em hemû heft heval bûn.

Ên ku hatibûne vexwendin ev bûn: Ji rojnameya Gündemê Yaşar Kaya û Ragîp Zarakolu, ji Enstîtuya Kurdî Abdurrahman Durre, ji rojnameya Welat Mazhar Günbat, muxabirê BBC Ragîp Duran, ji rojnameya Cumhuriyetê Yurda Gül û Evîn Aydar.

Dema ku em ji Derê Gumruka Xabûrê derketin û derbasî nav axan Kurdistanê Başûr bûn, heyeta Hikûmeta Kurdî ya Federe, waliyê Dihokê, çend qeymeqam, pêşmerge û parêzvanên wan, di gel 5-6 texsî û jipên leşkerî bi merasimek geş û xweş hatin pêşiya me û li ser navê hikûmetê selamên xwe pêşkêşî me kirin.

Bi rastî jî, ev rojê mezin bû ji bo min. Em ketibûn

**Bi rastî jî, mirov pesnê wê pîrozgehê bi qelem û gotinan nikare bîne ziman û teswîr bike. Divê mirov, bi çavên xwe bibîne û di emrê jîna xwe de carekê ziyaret bike. Jixwe baweriyê Yêzîdiyan jî wiha ye ku kesê di emrê xwe de carekê neçe Laleşê û xwe bi vê serdanê pîroz neke, îmana wî tune ye û ew kes bê dîn û kafir e.**

axa Kurdistanê azad, walî, serleşker û leşkerên Kurd hatibûne pêşwaziya me.

Xweymalên me yên ezîz û heja, em anîne Dihokê, bi izet, îkram û mêvanperweriyeke mezin em dilxweş kirin. Ew şev em li Dihokê man. Sibehê jî em, bi komek rew-

şenbîr, rayedarên Dihok û berpirsiyarên YNK'ê re, çûn serdana Laleşê ku herêma pîroz a Zerdestîyan, bav û kalên Kurdan ên kevnare bûye. Îro jî, qiblegaha Yêzîdiyan e, Ka'be û Qudsa wan e, bihuştê li rûyê zemîn e, ew herêma pîroz û bimbarek.

Bi rastî jî, mirov pesnê wê pîrozgehê bi qelem û gotinan nikare bîne ziman û teswîr bike. Divê mirov, bi çavên xwe bibîne û di emrê jîna xwe de carekê ziyaret bike. Jixwe baweriyê Yêzîdiyan jî wiha ye ku kesê di emrê xwe de carekê neçe Laleşê û xwe bi vê serdanê pîroz neke, îmana wî tune ye û ew kes bê dîn û kafir e.

Tiştê ku gelek bala min kişand li herêma Laleşê jî, weke herêma Mekeyê, hem Ka'be, hem çiyayê Erefatê, hem jî ava zemzemê hebû. Belê zemzema Laleşê ne bîr bû, kaniyeke spî bû ku jî binê zinaran weke çemê kewsera cenetê dikişiya. Çiyayê wê yê Erefatê jî, ne bi teht û kevir bû. Gul û gulistan, dar, belg û hêşinayî bû. Te digot qey çiyayê bihuşt û Firdewsê ye.

Di dawiyê serdana me ya Laleşê de, mîrê Yêzîdiyan Mîr Xeyrî, ji gundê Baednê hat. Ziyafeteke wilo mezin û delal pêşkêşî me kirin ku, tam nîşana şan, şeref, mêvanperweriya Kurdan û piroziya Laleşê bû.

Min li wir jî civatê re, rêzek ji helbesta Melayê Cizirî xwend:

"Dil geşt e min, ji dêrê naçin kenîştêyê qet  
Mîhrabê wê bi min ra werda biçîna Laleş".

Dû re min ji Dîwana xwe helbesta "Bavêzdiya Dihokê" jî wan re xwend:

"Bavêzdiya Dihokê, qesem bi Mishafa Reş  
Ku'j bo te dilhebokê, de em biçîne Laleş".  
Ku bi rastî jî em çûnê.



# Kolektîvîzm û ola îslamê

**Li hemû derê dinyayê û di hemû kom û civakan de tabû hene. Lê di civakên Rojhilata Navîn de mijara tabûyan gelşeke mezin e. Ev gelş nehiştiye kes, kom û civak xwe vekin û gelşên xwe bi awayekî vekirî binirxînin. Ji van tabûyan yek û belkî ya herî mezin jî ol e.**

## G. Koçer

Kolektîvîzm tîgînek e ku li ser hîsên hevpar bilind dibe. Ev hîsên hevpar ji bo komek, civakê an jî neteweyek dibin bingeha jiyane. Bi awayekî din endamên vê komê, civakê an jî neteweyê bi yek qaydeyî difikirin, diramin. Ev yek qaydeyî fikirandin û ramandinê, bi xwe re tabûyên mezin diafirîne.

Qedexeyên hişk ku ji bo ev tabû neyên eşandin, tîk bikaranîn jî, bi xwe ve bêagahiyên civakî tînin û rê li pêşveçûnan digirin. Helbet lînerîna tabûyan li gor civak, ol û sîstema polîtîk tîk guhertin û rengê guhertî digirin. Bi gotîneke din, ew mijarên ku ji aliyê olê an jî sîstema polîtîk ve tîk qedexekirin cuda cuda ne. Û li hemû derê dinyayê û di hemû kom û civakan de tabû hene. Lê di civakên Rojhilata Navîn de mijara tabûyan gelşeke mezin e. Ev gelş nehiştiye kes, kom û civak xwe vekin û gelşên xwe bi awayekî vekirî binirxînin. Ji van tabûyan yek û belkî ya herî mezin jî ol e. Em di vê nivîsarê xwe de dixwazin bi kurtî li ser vê mijarê bisekinin.

Ola îslamê şekleke jiyane ye û ew şekla jiyane bi awayekî kolektîvî tîk jiyîn. Yanê bingeha ola îslamê, hîsên olî yê hevpar

in. Lê di vî awayê kolektîvîzmê de, yanê di kolektîvîzma îslamê de cihê kesan wek serbixwe nînin e. Kes nikarin li gor xwe û di atmosfereke azad de biramin. Ev maf jî destê wan hatiye girtin. Ramîna serbixwe tabûyê mezin e.

Mekanîzmaya hevpariyê kesan kontrol dike. Mînak em bibêjin dema mirovek neçû nimêja cim'ayê, an jî rojî negirt, ji aliyê civatê, der û dorê wî ve tîk rexnekirin, heta tîk îzolekirin û dawiyê jî, ji civatê tîk avêtin. Ev mekanîzma jî xwe bi xwe tîk afirandin. Ev formeke cezakîrinê ye û dide nîşanê kî, yê di pratîkê de hîsên hevpar, ên ku civata der û dorê şeklekî dayê, bi cih neyîne, di civatê de jî şûna wî/wê tune.

Jixwê tîstê ku îro ola îslamê jî olên din, wek ola filehî vediqetîne jî ev e: Ola îslamê jî xwe re sinorek aniyê û ev sinor jî bi ferman û zagonan hatiye tesbîtkirin. Li ser tîstê tesbîtkirî jî nayê xeberdan. Her kes mecbûr e di vê daîrê de bilive. Ev daîre jî bi çarçoveya ayet û hadîsên ku ji dema pêxemberê ola îslamê tîk kesên ku di hiyerarşîya olê de rayedarên hûrandîne ne: ji wan ayet û hadîsan çî fêhm dikin ve hatiye mûnandin. Bi vî awayî ola îslamê xwe bi xwe nixandî û rexnekirina

xwe qedexe kiriye û deriyê munaqeseyan girtiye. Derî li munaqeseyên civakên ku di çarçoveya vê avahiya otorîter de mane, ji xwe re dinyayeke hundirîn pêk anîne û di vê de jî girêdayî û yeqînî çêkirine. Li vir divê mirov jî bir meke ku, di doktrînan de ev girêdayîn û yeqînî ne ji biryarên ku kes li ser xwe bigirin tîk, lê ji karîzmatîka otorîteyê tîk. Wekî ku me li jor jî got, di avahiyan otorîter de hîs vewartî ne. Kes li ser wan tîstên ku tabû ne, napeyivin. Raman bi tevayî xwespariyê tabûyan dibin.

Ev zêdeyî 1400 sal e di civakên îslamî de ev tabû wek nexweşiyek didomin. Li Rojhilata Navîn an tu kes newêribûye teşebusa van tabûyan bike an jî kirine, lê bi awayekî çewtî. Di vî warî de Misir, Îran û Tîrkiye di serî de, li gelek welatan: di vê çerxa dawiyê de teşebusa prosesê wiha çêbû. Lê belê wek ku encam di holê de ye prosesê wiha bi tenê bû kopîkirina kirina sîstemên Rojavayê. Çanda gelan, ramanên wan nehat biberçavkirin. Rayedar bi baweriyên gelên xwe tinaz kirin, bi çavê jêr li wan nêrin. Nexwestin civakê bi tevayî tîxin nav prosesa guhertinê. Xwestin bi sextekarî û xapandinê karên xwe bi cih bînin.

Mînaka Atatürk di holê de ye. Di eynî rojê de li Bursayê xutbe dixwîne, lê vegerê li Baleyîrgeha Esenboğa Xwedê înkâr dike. Bi kompoyên wiha çawa tabû dikarin werin leckirin?

Ji aliyekî din ve jî, em dizanin ku bawerîya olê bi hîsan ve girêdayî ye û ew bawerî di mejiyên olî de rûniştiye. Mirov ni-

kare baweriyê jî kesî bigire. Jixwe teşebuseke wiha rasterast bi lîstina kesaniyê ve girêdayî ye û dijî xwezaya mirovatiyê ye. Divê çî bê kirin?

Civakên me êdî nikarin bi tîgîna qedere bijîn. Em nikarin bi, "Rojava agahiya xwe jî Quranê girtiye" jî bijîn. Ev tîstêkî vekirî ye. Ji ew rojên ku Rojava dest bi leckirina tabûyên xwe kir heta îro, gelek bi pêş ve çûye. Em bipejirînin an nepejirînin, em bûne hewceyî wan. Li wir em bi tenê behsa teknolojîyê nakin. Hema wek mînakek toreyê, romanê li ber çavan e. Roman hilbirîna kê ye?

Em hewceyî pêşveçûnan in. Ji bo pêşveçûnan divê guhertin bê çêkirin. Ji bo guhertinan jî, divê alternatîvên nû bînin afirandin. Helbet alternatîv xwe bi xwe pêk nayên. Divê jî bo vê yekê, ji 'a' yê heta 'z' yê di her alî de munaqesê bînin kirin. Munaqesê hewceyî atmosferên azad in. Divê ew atmosfer bînin a-

firandin. Di van atmosferan de divê her kes, kom, netewe bikaribe pîrs û gelşên xwe bê tîrs bîne ziman. Heger qedra kesan zêde be, kes ewqas zêde hildibirînin, otorîteya tabûyan jî qontrola xwe wînda dike.

Kêmbûna otorîteya çêkirî jî, ji her alî ve pêşveçûyîna civakê ye.

Bêyî alternatîvên nû gelên Rojhilata Navîn nikarin bi Rojavayê re bikevin bezê. Alternatîv jî ne wêk bi qaydeyî Tîrkiyê ku bi qopya Rojavayê û Îran bi qopya îslamê tîne. Bi van qaydeyan ew dê herdem bindest û hewcedar bimînin û ji bo gestê destên xwe vekin. Di vî warî de barê giran dikeve ser milên Kurdistanê. Kurdistan di dema zayinê de ye û neteweyêkê cîwan e. Li ber wê mînakên dîrokî pîr in. Heger bizanibe jê dersan derxîne, wê karibe ji Rojhilata Navîn re jî bibe mînakek.

Ji bo vê: munaqeseyên vekirî, bi tabûyan ve tîkoşîneke lojîkî û însanî, zanîneke nerm û dadî, etîkekî (exlaqekî) zanyarî, nêzîbûna xwezayê kevîrên bingehî in.

## Bûka Kurdistanê Rêheval Welat Mihemed

Sortir bûne rengê sorgulan  
Pelan diweşînin sosin û rihan  
Roj sar bûye di nav lepên te de  
Dilê te yê mîna pola  
Bûye stêrka tarîşevan  
Rojeka biharê tu gihîştî axa  
Pîroz ya niştîman  
Te bi xwîna xwe cobarek vekir  
Ji Efrînê ta çarmedorên Kurdistan  
Sembola fedekarî, bîr û baweriyê  
Rêheval Welat di tîkoşîna me de dijî

M. Mihemed

## XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

**Çeperast:** 1-Zimanzanê xwediyê pirtûkên Hêmana Rêzimanê Kurdî, Pêşerîya Hewisîna Zimanê Kurdî (1-2). Di wêne de tîk dîtin 2-Cihê ku lê fêkî, zerzewat û qût tîk firotin/ Îşaret/ Sembola Neonê 3-Plaqa dewleta Malî/ Têkilî, pêwendî/Parêz, hîfz 4-Dibistan/ Notayek/ Celebek cedwelê 5-Yahût/ Qertafek rengdêrên wesfîn ku tîk paşîya peyvê/ Çeperên li dora bexçeyan 6-Rûniştvan 7-Navê nexweşînek hespan, ji hespê ku pê ketibe re dibêjin 8-Amîna filehan/ Hêt 9-Kesê xwe nade dest, ji tîştan direve/ Mûyên li rûyê mirov 10-Veketî, nivandî

**Serejêr:** 1-Hikumdar 2-Navê neteweyêke cînar/ Navê hacetek kolandinê 3-Navê tiliya mezin/ Nanê ku bê hevîrtîş hatiye çêkirin 4-Di notayê de dema seknê/ Nexweşîna ku ji ber bîrînen, ji hacetên zengarî pêk tîk 5-Liv, tevger, pizav/ Celebek ji pûta sewalan 6-Bi Erebi av/ Derdana ku ji axê çêdibe û av tîk de tîk cemidandin 7-Ziv/ Navê leşkerên ku ne peyade ne 8-Cînavka kesane ya yeke-mîna pirrehejmar/ Jinewarî, jinkî 9-Navê ayetek ji Quranê 10-(Bê pîrs e) 11-Navê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



Peymana Atlantîka Bakur 12-Fişek  
**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ**  
**Çeperast:** 1-Cemîla Celîl 2-Evîn/ Şekal 3-Mr/ Gevjol/ Ma 4-Badîkan/ Epîk 5-Ezel/ Aşîti 6-Lîs/ Îr 7-Îcazet 8-Alîkarî 9-Êdî/ Aras 10-Şe/ Arî  
**Serejêr:** 1-Cembelî/ Êş 2-Evraz/ Cade 3-Mî/ Delalî 4-Îngilîzî 5-Ek/ Sekar 6-Aşvan /Tarî 7-Cejn/ Ra 8-Eko/ Artîst 9-Laleş 10-Îl/ Pî 11-MîT 12-Xakî

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tîrkiyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahîp Sok.

Talas Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

**Mercên abonetiye:**

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM



# Ez qurbana hevalan bim!

Navê te çi ye?

- Esra

Esra tu çend salî yî?

- Îro, bibêjim çî, (berê xwe da diya xwe û jê pirsî) dadê ez bibêjim îsal? Nabêjim, nizanîm bibêjim (Dema diştexilî, tîqe tîqa wê bû, dikeniya).

Tu nizanî tu çend salî yî?

(Dîsa li diya xwe nêrî, diya wê jê re got, "Keça min bibêje çar)

- Ez çar salî me.

Tu naçî mektebê?

- Wê bavê min ji min re çente û onlik bikirre,

ez jî gava mezin bibim, herime mektebê.

Tuyê çi bikî li mektebê?

- Nizanim bibêjim.

Tuyê herî kîjan mektebê?

- Ya....

Kêfa te herî zehf ji kê re tê?

- Ji Apo re, ji heval re û ji Şueyp re.

(Şueyp birayekî wê ye di girtîgehê de ye)

Tu çiqas ji Apo hez dikî?

- Zehf

Tu ji bavê xwe zehf

hez dikî, an ji Apo?

- Ji Apo, ew Serok e û zehf mezin e.

(Xwişkeke wê ya salek jê mezintir jî li ba me rûniştiye û ew jî dixwaze gotinên di dilê xwe de bibêje. Keçikeke reş û pirr şîrîn e. Jixwe navê wê jî Reşê ye. Min berê xwe dayê û jê pirsî)

Reşê ka tuyê çi bibêjî?

- Ez jî naçim mektebê, ji xwe ezê herim ba hevalan, mekteb li wir jî heye, ew tev heval in, ez qurbana wan bim.

Tuyê li wir çi bikî?-

Ezê stranan bibêjim.

Tu kîjan stranan dizanî?

(Bi vê pirsar min re wê dest bi stranek kir)

- Em Kurd in sêrê çiya ne (Nizanibû bigota şêrê çiya, digot sêrê çiya, ji ber ku di şûna "ş" û "z" de digot "s") Kesk û sor ser e, em keça Kurdan, em keça Kurdan.

(Hîna ev stran neqediya, dest bi yeka din kir)

- Ser e ser e (yanê şer e, şer e) serê Kurdistan e, li çiyayê Botan ser e. Bizî bizî-(yanî bijî bijî) hez

bizî, Leyla Zana her bizî)

Tu Apo nas dikî?

- E, Apo serok e (Piştî vê bersivê Reşê, dîsa dest bi straneke din kir) Sîrîn Apo, Serok Apo qehremanê gelê me, tu her bizî Apê me.

(Di stûyê Esra de sê kefiyên kesk û sor û zer hebûn)

Ew çi ye di stûyê te de?

- Kesk û sor û zer e.

Kesk û sor û zer çi ye?

- Ew, kesk û sor û zer e, spî û gewher e, nîsana safer e, ey keçê Kurdan



Esra



Reşê

Rojêk yo masîvaneko belengaz benû. Wi û cînê xwi vêrî derya di niştênirû. Benî yîn qij iv, la belê yin wîrdiyoni ri bes iv.

Rojêk wexta merdim şino masoni, mesêko zer pyeşenûnde. Wexta masi kwenû twerê yi, vanû: "Heval û delal, mi mekişî, la belê mi raverd ez xwi rî bivî serwext. Heger ti destûrî bidî ez serwext iv, ezû hemû waştîşonî ti byarî ca. Qet çî yo qelbî ti şerû pê çinû?"

Merdîm qederek vînden û hiz'riyenû le belê çikî zî nyenû vîr. Masî ronê verde-nûra.

Wexte ku wi şondî yenû kî, ay çiyî ku yi qewimê. Cînê xwi ra vanû. Wexta cînek şinawit ku myerdê yi qê xwi çik niwaştû, zaf û weşon wezena!" va yê.

Roja cidim wexta merdim omi kişt derya, bi qêrî


Meselê masê zêr

## Çêk bênû çêk çînebenû

veng ke masê zerî va cîn yi wazena bibû warî kinconî newon. Şond wexta wi gêra kî, raştî otiir yo men-

zarêk omi ku bawêrî bi çimonî xwi niard. Cînê yi sari ra ta bini kinconî newe û rindoni di xemilnaya vî. La

belê cînek pê inyonî kêfweş nîbivî: "Siva gere ti masê zer ra vajî ku ez bonêko weş û gird wezena." va yê.



Roja bîn merdim qêra masî û va cînê yî bonêka gird wazena. U şond wexta omi kî, bonî yin o kon ci xwi di nyev. La helin da ku bonî yin o kon cê tediv, bonêko gird û newi viraziyavi. La belê cînek pê ini zê şanîbivî. "Siva gere ti masi zer bibîni û ca valî ku cînê mi qesrêka gird, ku te di runişû, wazena. Ez wazena bivî prînses û maso zer zî wî bivî berdestî mi," va yê.

U roja bîn merdimî qêrîk ke masî zer û ay çî yî ku çînê yi vatîvî, masî ra vatî. La wexta şond gêra omi kî, nî zî prînses dî. Yi bonî yin o kon û cînê xwi, ku kinconî konon vî dî.

\* Mi ina mesela zonî Norwecya Carnawa. Binge-hî xwi di ina meselê koncî welatya ez nîzona.



Roj hêdî hêdî ber bi ava ve diçû. Tariyê. konê xwe vedikir û bi ser bajarê Hesîçeyê re dixuşand. Bayekî hênîk li gel baraneke sivik xwe li rûyê mirov dixist. Ewqasî ezman xweş û şêrîn bûbû te digot qey, ji bo bûkaniyê keçeke Kurd xwe bi keske-so-ran xemilandiye.

Ev cara yekemîn bû ku ez diçime bajarê Hesîçeyê. Lê belê min gelekî li ser xwendibû û bi-hîstibû. Eger bi xweristiya (xwezaya) xwe ne çeleng be jî, dîsa cihê hozan û torevanan (wêjevan) e. Ji lew re mirov xweş didît ku her dem lê şevbuhêrkên toreyî çêbike...

Hem me deng dikir, hem jî em di nava wî bayê hênîk de dimeşyan: ber bi meqseda xwe ve diçûn. Hevalê bi min re û rê nîşanî min dida, gelekî heweskarê pîrs û bersivan bû. Pir jî bin çengên xwe derdixistin gelê me jî kesên wisa re dibêje, "Elfetûn" (Ji Eflaton hatiye). Car caran hem dipîrsî û hem jî bi xwe bersiva pîrsa xwe dida.

Hinekî serê xwe rakir û bi rêzdarî jî min pîrsî:

-Eger destûr hebe ez dixwazim bizanibim tu jî bo çi diçî cem Seyda?

-Belê...Belê, tu dikarî bizanibî çima na.

-Fermo, sedema hatina xwe jî hevalê xwe re bibêje.

-Ez sivik keniam û min pîrsa wî bi pîrsê bersivand:

-Ez jî dikarim bizanibim tu jî bo çi dixwazî bizanibî ez jî bo çi hatime...?

Ecêbmayî ma, hinekî fedî kir, li min meyzand û got:

-Biborîne, ez şaş bûm.

Ez nahêlim ew di wê rewşa fihêtiyê de bimîne, min destê xwe da ser milê wî û jê re got:

- Ji bo çêkirina hevpeyvînekê ez hatime, tu dizanî riya min çi qasî dirêj kir?

-Na, çi qasî dirêj kir?

-700 km, hindik e?

Ecêbmayî (matmayî) ma, serê xwe hejand û pişt re got:

-Layîq e...

Li pêşiya xaniyekî em sekinîn. Xaniyekî celbîn bû, jî derve ve diyar dibû ku, xwediyê wê xizan e. Berî ku em li derî bidin, min jî hevalê xwe yê rêber pîrsî:

-Gelo, li malê be?

- Ji bo vê hatinê me ew agahdar kiriye, eger tu tiştêkî awarte derneketibe, ez bawer dikim jî malê naçe. Gelekî mêvanperwer e, bi taybetî jî mêvanên biyanî, biborîn mebesta min mêvanên jî dût ve têt.

Bi hêviya hevdişînê me deng bi derî xist. Piştî kêliyêkê, derî sînga xwe jî me re vekir. Mirovekî 68 salî, bi kurk, egal, keras û tizbiyên di nava tiliyan de pêrgîni me hat. Di destpêkê de min bawer nekir ku ew be, jî

# Seydayê Tîrêj



## Dilbixwîn

**Ji hemû aliyan ve Tîrêj, seydayekî hozan e, heya tu bibêjî li ser pênuşa xwe hakim e; hestên wî heya dawiyê hozanî ne, bi honandin û hevokandinê hosta û şareza ye... Tîpan li ser dilan dikole. Cihê dax û mixabinê ye ku, tevî vê rûmetdariyê jî Seydayê Tîrêj li aliyekî bédeng û hema hema jibîrbûyî maye. Dîsa tu caran dîrok nikare jî bîr bike ku, Tîrêj yek ji pêşemîn hozanên Kurd ên welatparêz e.**

lew re ez hinekî bédeng mam.. Lê wî perdeya bédengiyê şikand û got:

-Wey hûn li ser serî û çavan hatin.

Hevalê min berê xwe da min û got:

-Mamoste û Seydayê me Tîrêj.

Bi rêzdarî Seyda hate rûye min û got:

-Kerem bikin, derbas bin, çavên min li riya we westabûn, hûn gelekî dereng man.

Bê mucamele ez li hember hozanekî pîrs bi nîrx û buha bûm, hozanekî (şairekî) tu caran jî bo bilindbûna navê xwe, xwe nefirotiye tu partî-martîyan. Nehatiye xapandin, nehatiye firo-

tin, weke zêrekî zelal û niştîmanperwer maye, herdemê hozanê welat, azadî, serxwebûn û serfiraziyê bûye..

Bi çi destûrê li pêşiya pêşketina Tîrêj bûne kelem û nehîştîne ew jî stêrka xwe bilind bike, xwe bi gelê xwe bide naskirin û ji wan re helbestên xwe bixwîne...?

Çima piştgiriya hinek hozanans kirine, çima hinek jî bîr kirine... Gelo sedem çi ye?

Piştî bixêrhatinekê em dest bi diyaloga xwe dikin, ez dipîrsim ew dibersivîne, hin caran jî ew dipirse ez dibersivînim.

Ji hemû aliyan ve Tîrêj, seydayekî hozan e, heya tu bibêjî li ser pênuşa xwe hakim e; hestên

wî heya dawiyê hozanî ne, bi honandin û hevokandinê hosta û şareza ye... Tîpan li ser dilan dikole.

Cihê dax û mixabinê ye ku, tevî vê rûmetdariyê jî Seydayê Tîrêj li aliyekî bédeng û hema hema jibîrbûyî maye. Dîsa tu caran dîrok nikare jî bîr bike ku, Tîrêj yek ji pêşemîn hozanên Kurd ên welatparêz e.

Di dibistana realîzmê de cihê xwe digire, di evîndariyê de şagirtêkî Dibistana Sor e, car caran jî xwe şagirtê Dibistana Sofiyîzmê dibîne.

- **Helbestên te weke deryan in, pêlên wan gelekî xurt in, mirov nikare xwe jê biparêze. Her helbesteke te**

**nimûneyeka jiyanê ye. Ez niha neçar dimînim dipîrsim, gelo sedem çi ye ku heya niha Seydayê Tîrêj di tariyê de maye, weke hinek hozanan deng nedaye?**

Berçavka xwe danî ser mayeyê, sivik keniya û pişt re got: "Hîna min tu caran xwe di tariyê de neditiye, belê astengên diravî gelek in, lê dîsa jî min her demê xwe di ronahiyê de, ditiye. Ez baş tédigihêjim tu dixwazî çi bibêjî, bi rastî hîna ev pîrs nehatiye bîra min û min jî xwe nepîrsiye.

Ez jî bo nav û dengê xwe, jî bo ku her kesek bizanibe Tîrêj kî ye nanivîsinim. Hozanî hestek e, dema ku ew hesta pêl di-de, ne nav, ne şuhret û ne jî tiştêkî din nayê bîra min. Welat, serxwebûn, azadî, mirovahî, hezkirin, welatparêzî... nave-rokên helbestên min in, şewata wan dihêle ez binivîsinim. Vê dawiyê şehîdan jî ez gelekî êşandim, barê min giran kirin, ez ev şairim.

Di axaftina xwe de, gelekî bi xwe bawer bû. Nizanibû axaftinên bi dizî bibêje û kêmasiyan biparêze, "Bi gel dilîzin, gel difirosin, nizanin serokatiyê bikin. Hem nizanin, hem jî li pêşiya serokatiya hemdemî dibine kelem. Otonomî jî bo gelê Kurd ne çare ye, lê dîsa jî dev jê bernadin, çawa be jî, em jî derdê xwe re serxwebûn û azadiyê derman dibînin..." nêrîna wî li ser hinek partiyan ev bû.

- **Tu rewşa Kurdan çawa dibînî? Tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê ya di bin serokatiya PKK'ê de, bi rola xwe radibe yan na?**

- Ez dikarim bibêjim Kurdistan nû hişyar dibe, nû şa dibe. PKK roj e, min di helbesteke xwe de wiha aniyê ziman:

**Kurd rabe ser hilde ji xew Şev çû êdî berbange ye Rojê ji reş ve hilveda Pir gulşen û pir şu'le ye**

**Bizan bi sed ax û xwezî Dest naçe ser baqê kezî Dijmin şivan e, tu pez î Sed gur li te peywane ye**

Şevbuhêrka me gelekî dirêj kir. Li ser hemû pîrs û pîrs-girêkan, hem siyasî û hem jî torevanî.

Çi qas şevbuhêrkeke xweş bû, ezê nikaribim jî bîr bikim. Bi hêviya hevdişîneke din, min xatirê xwe jê xwest. Di ser wê şevê re ev nêzikî sê (3) sal derbas dibin, lê weke ku niha hati-be çêkirin.

Seydayê Tîrêj (di sala 1923'an de hatiye dinyayê), bi min re heya derî rawestiya û got: "Ji min re serok silav bikin..."

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar  
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat  
• Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87  
• Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715  
• Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.